

HETA SALA ÇÛYÎ JÎ LI DIBISTANÊN NORWECÊ ZAROKÊN KURD
BI ZIMANÊ XWE DERS DIDÎTIN. LÊ MIXABIN ÎRO:

ZAROKÊN KURD LI NORWECÊ LI MAMOSTEYÊN KURDÎ DIGERIN

● Li gelek bajarên Ewrûpa dersên bi zimanê kurdî tîn standin. Li Norwecê jî zarokên kurd berê bi kurdî ders digirtin. Niha tenê bi zimanên biyan dixwînin û dinivîsin.

● Berê mamosteyên zarokên kurdî jî hebûn û ji vî mafê xwe yê neteweyî îstifade dikirin. Îro her diçe hêviya zarokên dibistana îla jî, ji mamosteyên kurdî qut dibin.

Rûpel 8-9



Xwendevanên Özgür Ülkeyê piştî sansurkirina nivîsên wê wiha dibêjin:

Logo tenê bimîne emê dîsa bistînin



● Xebatkarên Özgür Ülkeyê niha li sê cihên cuda dixebitin. Hinek weşanên demokrat û sosyalîst cihê xwe jî wan re vekirin. Niha ew xwe amade dikin ku biçin cihê xwe yê nû, bi teknîkeke pêşkeş, rojnameyeke xweşîkirî pêşkeşî xwendevanên xwe bikin.

● Baki Karadeniz: "Kirinên ku li dijî Özgür ülkeyê pêk tînin aliyekî politikaya dewletê ya li dijî tevgera demokratîk a gelê kurd e. Dewletê îmhakirina tomerî daniye pêşiya xwe."

Rûpel 2-3

Kovara Kurdistan

Kurd ji rojnamevantiyê re ne xerîb in. Li gorî gelên Rojhilata Navîn, bi hêsanî dikare were gotin ku ev gel xwediyê dîrokeke kevin a rojnamevantiyê ye. Rojnameya pêşîn, kurdan li Qahîreya Misirê bi navê 'Kurdistan'ê derxistine.

Rûpel 13

Şerefxan Bidlîsî û Şerefname

Pirtûka Şerefname ku nivîskarê mezin û dîrokvane bi nav û deng ê gelê me Şerefxanê Bidlîsî nivîsandîye, heya roja îroyîn bi mezintirîn û berfirehtirîn berhemek tê jimartin (hesibandin) ku der heqa dîroka kevn a kurdan de hatiye nivîsandin.

Rûpel 7

Divê ziman neyê xesandin

Zimanzan, zimanan nakesixînin, dişitilînin, aşêf dikin (ji bêjeyên biyanî paqij dikin). Rastî ev e, zimanzanîti ev e, xizmet ev e. Tîrsa min ev e ku rewşenbîrên me dê rojekê bibêjin: "Xwendin, axaftin û nivîsandina bi zarê kurmancî dijwar e.

Rûpel 11

Hisênê Mensûr-Helac

Helac, bi nav Hisênê Mensûr e. Di nava hozaniya (filezofiya) derwêşiyê (sûfîzm) de cihekî berz û bala digire. Helac, li bajarê Beyzayê (li Îranê) hatiye rûyê dinyayê. Di dema Ebasiyan de dijiya. Bîr tûj, hîstenîk û dilşewitiyê mirovahiyê bû.

Rûpel 12

XWENDEVANÊN ÖZGÜR ÜLKEYÊ PIŞTÎ SANSURKIRINA NIVÎSÊN WÊ WIHA DIBÊJIN:

LOGO TENÊ BIMÎNE EMÊ DÎSA BISTÎNIN

Xebatkarên Özgür Ülkeyê niha li sê cihên cuda dixebitin. Hinek weşanên demokrat û sosyalist cihê xwe ji wan re vekirin. Wisa dixuye ku polîtîkayên dewletê yên neheq nikarin dengê wê bibirin. Niha ew xwe amade dikin ku biçin cihê xwe yê nû, bi teknîkeke pêşketî, rojnameyeke xweşiktir pêşkeşî xwendevanên xwe bikin.

Baki Karadeniz: "Kirinên ku li dijî Özgür ülkeyê pêk tên aliyekî polîtîkaya dewletê ya li dijî tevgera demokratîk a gelê kurd e. Dewletê îmhakirina tomerî daniye pêşiya xwe. Wê, di roja 2'yê adarê de bi derbeyekê parlamenterên kurd ji meclîsê avêtin, pişt re partî radan, mebûs avêtin girtîgehê. Niha dewlet bi ser hemû kes û saziyên azadîxwaz yên gelê kurd ve diçe. Êrîşa bi ser Özgür Ülkeyê ve jî encama vê polîtîkayê ye.



Gerîndeyê Giştî ya Weşanê Baki Karadeniz



Ebûqat Osman Ergin



Makîneya ku ji bin xerabeya Özgür Ülkeyê hatiye derxistin, dixebite.

Piştî ku rojnameya Özgür Ülkeyê di 3'yê meha berfanbarê (meha 12'yan) de hate bombekirin, dewletê hêvî dikir ku dengê Özgür Ülkeyê bi tamamî bête birin, lê berevajiya vê yekê, dengê wê bilindtir bû. Wekî Berpirsiyarê Karê Belavkirinê Zülküf Kışanak jî dibêje, roja piştî bombekirinê tiraja rojnameyê hilkişî 22 hezaran, hejmara rojnameyên ku bi destan dihatin belavkirin jî li Stenbolê tenê ji 700'î hilkişî 1800'î. Gerîndeyê We-

şanê yê Giştî Baki Karadeniz jî, bal dikişîne ser vê rewşê û dibêje ku raya giştî piştî bombekirinê alaqeyeke baş nişan daye, saziyên demokrat û kesên rewşenbîr li rojnameyê xwedî derketine. Dewletê dît ku bi vî awayî rojnameyê nikare bide sekinandin, roja 6'ê rêbendanê bi civîna MGK'ê (Lijneya Ewleyî ya Neteweyî) biryareke nû stand. Piştî vê biryarê dozgerên DGM'ê (Dadgeha Ewleyî ya Dewletê) li çapxaneyê dest danî ser Özgür Ülkeyê. Bi vê kirinê jî qonaxa rojnameya bisansûr dest pê kir. Ji ber ku dewletê ji vî karî re qilîfekî qanûnî dîtibû, li hemberî kirinê raya giştî jî zêde reaksiyon nişan nade. Baki Karadeniz vê yekê bi du tiştan ve girê dide, yek jê ev e; gelek kes kirinê qanûnî dibînin. Her çiqas wek Parêzerê rojnameyê Osman Ergin dibêje, "her kirina qanûnî ne hiqûqî ye" jî, dewlet ji bo kirina xwe madeyeke qanûna binge-hîn nişan dide, gelek kes vê kirina dewletê normal dibînin. Divê bê zanîn ku dewlet di vî karî de neheq e û mirov divê li hemberî van kirinan derkeve. Li aliyê din dewlet rê nade ku ew mesajên xwe bigihînin gel, nivîsên tê de qala sansûrê dibe, tên berhevkirin.

MEBESTA DEWLETÊ ÇI YE?

Baki Karadeniz li ser sedemên vê kirinê wiha dibêje: "Kirinên ku li dijî Özgür ülkeyê pêk tên aliyekî polîtîkaya dewletê ya li dijî tevgera demokratîk a gelê kurd e. Dewletê îmhakirina tomerî daniye pêşiya xwe. Wê, di roja 2'yê adarê de bi derbeyekê parlamenterên kurd ji meclîsê avêtin, pişt re partî radan, mebûs avêtin girtîgehê. Niha dewlet bi ser hemû kes û saziyên azadîxwaz yên gelê kurd ve diçe. Êrîşa bi ser Özgür Ülkeyê ve jî encama vê polîtîkayê ye. Dewletê pêşî xwest bi şidetê dengê me bibire, ji lew re gelek hevalên me hatin girtin, gelekên îşkence dîtin, gelek jî hatin kuştin. Roja 3'yê berfanbarê rojname hate bombekirin, lê ev polîtîka bi ser neket. Îcar vê riyê diceribî-

nin." Hemû xebatkarên rojnameyê didin zanîn ku armanca dewletê sekinandina weşana rojnameyê ye.

NIHA KAR ÇAWA DIMEŞE

Di destpêkê de du rojan dewletê nehiştiye ku li Stenbolê rojname belav bibe. Zülküf Kışanak dibêje ku di serî de li bajarên wekî Edene, Enqere, îzmîrê xwendevanan rojname, berî yên Stenbolê û bêsansûr bi dest xistin, pişt re dewletê rê li ber vê jî girt. Rojên pêşîn çawa ku rojname ketiye çapê polîsan çend heb hildane, birine cem dozger, dozgerê nobedar û tevî biryara berhevkirinê, bilezûbez hatine dest datanîn ser rojnameyê. Berpirsiyarê Karê Çapxaneyê Abidin Çelik dibêje: "Du sê rojên pêşîn em hinekî ji hatina polîsan tengezar bûn, lê pişt re em elimîn." Niha rojname pêşî bi roj qasî 500 heb ji bo sansûrê tên çapkirin. Ber bi êvarê dozger, nivîsên 'bixetere' jê dineqîne, ew jê tên derxist, roja duwatir (li dora rojê) ji nû ve dikeve çapê. Ebûqat Osman Ergin dibêje ku "ji di serî de dozgeran li gorî mejû (tarîx) û hejmarê biryara berhevkirinê dida, lewma pir caran polîsan dest datanî ser rojnameyên sansûrbûyî jî. Ew dibêje ku ji bo rêlibergirtina vî karî, wan hejmara çapê jî li ser rojnameyê nivîsandiye û dozger jî di vî warî de serwest kirîye.


FÊRBÛNA SANSÛRÊ

Ji daxuyaniyên rayedaran Özgür Ülkeyê mirov fêr dibe ku hêzên dewletê bi sansûrê jî nasekinin. Li gelek deran rojnameyê bi awayekî bêqanûnî berhev dikin û nahêlin ku rojname bikeve gelek deveran. Hîn jî xebatkarên rojname besebeb têne girtin. Parêzer Osman Ergin dibêje ku wê dozger, der barê nivîsên belavnebûyî de jî dozê vekin. Ew dîsa dibêje ku dozvekirin wê bibe sedemê gengaşiyê hiqûqî. Ji ber ku li gorî hinek mehkemeyên tirk ji bo dozvekirinê weşandin bes e, lê hinên din dibêjin: "Divê aleni-

JUJÎ

Doğan Güzel

* DGM nivîskarê bi nav û deng
YASAR KEMAL "mehkeme" dike...



Girtiyên newxêş û birîndar li ber mirinê ne

Piştî êrişa li ser Girtîgeha Diyarbekirê, bi sedan girtî, birîndar surgunî Girtîgeha Entabê bûbûn. Ji van girtiyên birîndar ku surgun bibûn, Süleyman Ongun di Girtîgeha Entabê de 20'ê rêbendarê mir. Li gorî agahiyên ku gihîştin destê me, Süleyman Ongun, piştî birîndariya xwe ne hatiye tedavîkirin ji berwê miriye. Gelek girtiyên birîndar û nexweş nayên tedavî kirin û ji aliyê rêvebirên zindanan ve ji mirine re hatine terk kirin.



Xebatkarên Ülkeyê di dema xebatê de

yet hebe." Ergin dibêje: Ev qanûn ji berê ve hebû, lê niha derket ber me. Helwesta dozger û dadgerên tirk li gorî hewayê (atmosfera) siyasî diguherin û ew jî dide nîşan ku li Tirkîyeyê mehkeme ne serbixwe ne.

HETA GEL BIXWAZE WÊ DERKEVE

Sansûr ji aliyê madî ve barekî giran e, her çiqas sansûrê zêde tesîr li tirajê nekiribe jî. Ji bilî vê, rojname bi vî halî bersivê nade pêdiviyên xwendevanan, Zülküf Kışanak dibêje: "Hinek xwendevanên me heta navendê tî jî bo rojnameyê bêsansûr."

Tevî hemû tengasiyan jî xebatkarên rojnameyê dibêjin, "Heta gel bixwaze, wê rojname derkeve." Baki Karadeniz li ser vê mijarê wiha dibêje: "Ev ne rojnameyê sermayedaran e, ne ji bo pere qezenckirinê derdikeve, ev xwediyê misyonê ye, li piştê me xwendevanên me hene, heta me misyona xwe anîye cih wê derkeve." Sanlı Ekin piştî ku biryardariya xwendevanan ji devê wan bi gotina, "Heke tenê logo bimîne

jî emê bistînin" da zanîn, dibêje: "Em dixwazin rojnameyê xurt bigînin xwendevanên xwe, lê dewlet nahêle, ji lew re heta gel bixwaze wê rojname derkeve. Ev ne rojnameyê ketûber e, êdî bûye malê dirrokê, em bi vê baweriyê dixebitin." Abidin Çelik, vê qonaxê wekî pêvajoyê demdemî di nîrxîne, dibêje: "Ev edî hewldanên dawîn yê dewletê ne, lê sansûr ne çare ye, dewlet bi vî awayî nikare tiştekî bidest bixîne." Ji servîsa îstixbaratê Hasan Hüseyin İnan dibêje: "Dema em diçin nûçeyekê, mirov me wekî xebatkarê 'rojnameya bombe-kirî' bi hev didin nasîn, li hemberî helwesta rojnameyê giramgiriya xwe nîşan didin, ew tişt me şanaz û serbilind dike." Ji servîsa teknikî Mehmet Demir, dide zanîn ku ji aliyê teknîkê wan piştî bombekirinê gelek zehmetî kişandiye. Ew dibêje: "Em niha li sê cihan dixebitin û cihên em lê dixebitin pir teng in. Pir caran cihê rûniştinê bi dest mirovan nakeve."

SAMÎ BERBANG
ESNAS MAYA


PKK'ê peymanê Cenevreyê îmze kir

Li Kurdistanê nêzîkî 10 sal in ku şerekî gemarî tê domandin û di vî şerî de bihezarane sivîl mirin e. Ji bo ku ev şerê gemarî êdî zirarê nede sivîlan û biqade yê cengê bidome, PKK'ê peymanê Cenevreyê îmze kir. Di 24'ê rêbendanê de li ser navê PKK'ê Berdevkê ERNK'ya Ewropayê Ali Sapan û li ser navê serokatîya Xaçê Sor jî Andre Collomb peyman îmze kirin.

Piştî bombekirina Özgür Ülkeyê Sekreterê Giştî yê PKK'ê Abdullah Öcalan di daxuyaniya ku dabû BBC'yê û nivîskarê Özgür Ülkeyê İsmet İmset de gotibû: "PKK hukmê konvansiyona Cenevreyê qebûl dike û

jî ber ku aliyekî cengê ye, wê teahûtên xwe bîne cih. Li gorî peymanê Cenevreyê ya madeya 3'yemîn, emê, rewşa ku Xaçê Sor karibe çavderiya cengê bike ava bikin. Wê çaxê kî qatîdeyên cengê îhlal dike, wê derê holê."

Tê zanîn ku, 172 dewlet û Tirkîyeyê jî ev peymanê di sala 1954'an de îmze kirine. Lê di sala 1977'de du protokolên nû jî îmzeyê re hatine vekirin. Tirkîyeyê ew protokol îmze nekirine. Piştî ku PKK'yê peymanê protokolên nû îmze kir, Tirkîye jî divê wan îmze bike. Ku îmze neke wê çaxê wê jî dinayê tecrît bibe. Îmzekirina peymanê jî bo xelasiya şerê ge-



Ji nûnerên ERNK'ê
Ali Sapan

marî û wekî aliyekî şer nasbûna PKK'ê gaveke dîrokî ye.

Navenda Nûçeyan

Welatê Me çû DGM'ê

Rojnameya me jî deriyê Dadgeha Rewlekariyê ya Dewletê (DGM) ya Stenbolê vekir. Ji ber nivîsên di hejmarên Welatê Me yê 4, 5, û 6'an de, Xwedîya Rojnameyê Aynur Bozkurt û Berpirsiyarê Karê Nivîsaran Mehmet Gamsiz îfade dan dozger.

Dozger, bi hinceta

ku di nûçe û hevpeyvînan de li dijî yekîtiya neteweyî û yekparetiya axa Tirkîyeyê propaganda hatiye kirin, doz vekir. Wê, xwedî û berpirsiyarê karê nivîsaran li gorî "Qanûna Têkoşîna bi Terorê re" ku bi navê madeya 3713 jî tê zanîn, bîr darizandin (mehkemekirin).

Li gorî ku dozger

Abdulkadir Dirîarin da zanîn, hejmarên ku di wan de li hemanên sîc hene ev in.

Di hejmarê 4'an, rûpela 10'an de nûçeya bi sernavê "Zêdeyî 500 kes hatin kuştin" ku li ser lihevixistinê hêzên dewletê û yê ARGK'ê ne, di hejmarê 5'an rûpela 12'an de hevpeyvîna bi ser-

navê "Em di sala go-venda serxwebûnê û azadiyê de dilizin" û hejmarê 6'an di rûpela 10'an de nûçeya bi navê "Ji artêşa tirk firar zêde dibin" û rûpela dawîn a vê hejmarê de hevpeyvîna bi navê "Edene bûye wek bajarekî Kurdistanê."

Navenda Nûçeyan

Dewlet berî dide cerdevanan jî

Li Mêrdînê, li Dêrikê, gundên cerdevanan Şerîbaba, Şerker, Hoz, Gamîrî, Selamet û Susikê jî bo valakirinê di bin

pêkûtiya dewletê de ne. Li gorî agahiyên ku gihîştine destê me, qumandariya jendirmeyên Dêrikê, ji gundiyan re gotine, "Ji îro

pê ve em 15 rojan west didin we. Hûn gundan vala nekin êdî hûn dizanin." Beriya du hefteyî li van gundan 150 cerdevan ketibûn bin-

çav. 3 cerdevan dibin çav de hatibûn kuştin, 4 cerdevan hê jî dibin çav de ne. Cerdevanên din hatin berdan.

Navenda Nûçeyan

Gelo kîsik biçûk e an derew mezin e?

Navên
10 kesên ku
di xaçepirsa
hejmara 9'an de
peyva veşarî
'Seyîd Riza'
dîtine û xelat
gezenc kirine.

Metin Kurt
Mersin

Güften Özkul
Burdur

Behiye Akdağ
İzmir

A.Baki Özbay
Ağrı

Özgür Serda
Kızıltepe/Mardin

Şehmus Özgür
Adana

Egîd Karay
Bursa

Özlem Karasungur
Burdur

Fikret Arda
Diyarbakır


Kartal Jindar
Antalya



Li gorî
dewleta
tirk
pîrs-
girêka
kurdî
tune,
PKK
jî bi
temamî
qediya-
ye!
Va ye,
di
heftiya
dawî de
çend
nûçe ji
çape-
meniya
tirk.

Xaçepirsa me bixelat e.
Di 15 rojan de çi bersiv
bigihîjin me, em
dinirxînin. Xelat bi usûla
qurayê li deh kesan tîn
belavkirin. Xelata vê
heftiyê pirtûka
Harold Pinter
"Zimanê Çiya" ye.

Xelata Xaçepirsê



"Zimanê Çiya"
Harold Pinter

Jêrenot:

Ji bo ku bersiva we
bê nîrxandin, divê hûn
"Peyva Veşarî" di nava
qutiyên li bin xaçepirsê
binivîsînin û tevî adresa
xwe ji me re bişînin.

AGAHIYÊN ABONETIYÊ

Min Welatê Me divê

☐ 3 Meh	☐ Li Hundir	☐ Li Derve
☐ 6 Meh	☐ 400.000 TL	☐ 35 DM
☐ 12 Meh	☐ 800.000 TL	☐ 70 DM
	☐ 1.600.000 TL	☐ 140 DM

Bedelê Abonetiye ez radizînim

Li Tirkîyê – Roza Basın ve Yayın. San.Tic.Ltd.Şti.
Yapı-Kredi Parmakkapı Şubesi
Hesap No: 1100264-1

Li Derve – Roza Basın ve Yayın. San.Tic.Ltd.Şti.
Yapı-Kredi Parmakkapı Şubesi
Döviz Tevdiat Hesap No: 3001507-3


NAV û PAŞNAV :
NAVÎŞAN :

Navnîşana Welatê Me

Ayhan Işık Sok. No:23/3 Beyoğlu/ İST.
Tel-Fax: 2491344 – 245 29 91

X A Ç E P I R S A B I X E L A T

Şahî	Partiya Berzani Razan	Navekî mêran	Gihanekek	Ji dûmanê agir çêdibe	8	Rih
Şairê di wêne de			Cetwelek	Cihê kayê		
	9			Sewalek		
Sahne			Bermalî	Hevala zavê	6	
Qemç			Heyecan			
		Ceh		Kesê li ûdê dixê		Eziyet
		Cem, bal		Sembola Qalayê		
Kurdolo-gekî biyan	1					Jan
Rûniştin						
		10		Ne dût		3
				Sembola Oksijenê		
Emîr, prens	Tav			Pê por tê rastkirin		
				Ufq		
		4	Notayek	Aveke kîmyewî ku dişewitîne		Cejn
Bêav	Sembola Osmiyûmê			5		
		2		Menzel		



PEYVA VEŞARÎ

1 2 3 4 5 6 7 8 9 10

BI ÇAVÊ RAYEDARÊN DEWLETA CEZAYÎRÊ RÊXISTINA ÎSLAMÎ

FIS'Ê SÎSTEMA DEMOKRATÎK QEBÛL NEKIR

Raşîd Haddad, li ser xurtbûna FIS'ê jî, dibêje ku rêveberiya FLM'ya ku şerê neteweyî bir serî, piştî salên 1980'yî ji armanca xwe dûr ketiye. Problemên gel çareser nekirine. Ew dide zanîn ku niha li Cezayîrê 500 hezar kesên bêmal hene, FIS'ê li vê rewşê kelk (feyde) standiye,



Balyozê Cezayîrê li Tirkîyeyê Raşîd Haddad, li hemberî daxwaza aştiyê, gotinên klasîk dibêje.

Şerê li Cezayîrê ji rêbendana (meha 1'an) 1992'yan bi vir ve dewam dike. Di wî şerê navbera dewletê û hêzên îslamî de, kesên sîvil jî di nav de gelek mirov hatin kuştin. Şer, bi îptalkirina hilbijartina berfanbara 1991'an dest pê kir. Dema ku di hilbi-

jartinê de FIS (Eniya Sela-metê ya Îslamî) bi ser ket, artêşê hilbijartinê iptal kir û ew rêxistin qedexe kir. Li ser vê yekê hêzên îslamî dest bi şerê çekdarî kir.

Balyozê Cezayîrê yê li Tirkîyeyê Raşîd Haddad di hevpeyvîna xwe ya ku roja 23'yê rêbendanê bi

Turkish Daily News'ê re kiribû de li ser îptalkirina hilbijartinê wiha dibêje: "FIS'ê sistema demokratîk û bi pirpartî qebûl nedikir, heke ew bi ser keta wê ew hilbijartin bibûya ya dawîn. Ji ber vê sedemê kirina artêşê li cih bû."

Xeynî wê, Haddad îdî-

a dike ku belediyeyên îslamî yên liste amadekirinbûn, di amadekirina listeyên hilbijêran de gelek sextekarî kirine, gelek kesên mirî wekî hilbijêr hatine nivîsandin, kesên li dijî wan jî qerta hilbijêriyê bi dest nexistine. Balyozê Cezayîrê dîsa dibêje ku bi milyonan kes

beşdarî hilbijartinê nebûne û ji bo van sedeman encama hiljartinê ne adîlane bûye.

Raşîd Haddad, li ser xurtbûna FIS'ê jî, dibêje ku rêveberiya FLM'ya ku şerê neteweyî bir serî piştî salên 1980'yî ji armanca xwe dûr ketiye. Problemên gel çareser nekirine. Ew dide zanîn ku niha li Cezayîrê 500 hezar kesên bêmal hene, FIS'ê li vê rewşê kelk (feyde) standiye, lê çare nîşan nedane tenê gotine: "Em xaniyan nadin we, ji bo xwedê ji we reyan dixwazin."

Raşîd Haddad li ser qedandina şer û vekirina riya diyalogê gotinên wekî yên dewletên din bi lêv dike: "Heta FIS terorê lanet neke, em bi wê re li hev rûnanin." Ew li ser civîna hêzên dijber ku ji bo aştiyê li paytexa Îtalyayê çêbû jî argûmanên klasîk pêşkêş dike. Dibêje: "Ew çima li derve civîne, em wekî mirovên dildarên serxwebûna xwe ve civînê li cih nabînin." Balyoz Haddad, li ser sedemê civîna li derve nasekine. Ew dadixuyîne ku wê îsal li Cezayîrê hilbijartina serrokkomartiyê çêbe, riya diyalogê jî hinekî vekirî dihele.

Nûçeyên Derve

Rêxistina Ewlekarî û Hevkariya Ewrûpayê bi beşdarbûna sîh û pênc welatan di 1'ê gelawêja 1977'an de li paytexta Fînlândiyayê li Helsînkîyê hatibû çêkirin.

Piştî têkçûna sosyalîzma reel dewletên nû derketin holê û bi endambûna van dewletan, hejmara endamên REHE'yê gihîştê pêncî û sisiyan.

Her çend nav, Rêxistina Ewrûpayê ye jî, lê hin dewletên endam ne li cografîya ya Ewrûpayê ne. Wekî DYA û Kanadayê. Di navbera van herdu dewlet û dewletên Ewrûpî de têkiliyên dîrokî, çandî û aborî hene. Gelo çi pêwendiyên ve rêxistinê û şeş komarên tirkî yên li Asyaya Navîn hene? Ji derî berjewendiyên Ewrûpiyan yên li wê herêmê. Ne pêwendiya cografî û ne jî ya çandî. Xuya ye Ewrûpa li gorî berjewendiyên xwe, dixwaze cihanê ji nû ve organîze bike, ewlekarîya xwe xurt bike.

Lê, li hev nakin û li hev hatin wisa ne hêsan e. Ji ber vê yekê, civîna REHE'yê ya li Budapeştayê ku di 5-6'ê meha Berfanbarê de pêk hat, balkêş bû. Di vê civînê de ji derî nav guherîna (konferans bû rêxistin) encameke

REWŞA DINYAYÊ

ROBÎN REWŞEN

Civîna REHE'yê li şerê Çeçenîstanê

balkêş derneket. Zêdetir nakokî û dubendî derketin holê.

DYA û dewletên Ewrûpayê, Rûsyayê hîn wekî talûkeyeke potansiyel dibînin û her du alî jî, ji hev ne bawer in. Atmosfera bêbaweriyê li civînê serdest bû.

Gotûbêja dijwar zêdetir li ser xala sînorên NATO'yê çêbû. Dewletên Ewrûpaya Navîn dixwazin bibin endamên NATO'yê. NATO jî ve daxwazê di cih de dibîne. Lê Rûsyayê hem di vê civînê de û hem jî beriya ve civînê nera-zîbûn û hêrsbûna xwe bi tundî diyar kir.

Heke ev dewlet bibin endamên NATO'yê. NATO û Rûsya dibin hevsîn-

û bi vî awayî dor li Rûsyayê tê girtin, dest û lingên wê tenê girêdan. Hêrsbûna Rûsyayê ji ber vê yekê ye û dixwaze wekî berê xwediyê gotin û însiyatîfê be. Ev jî li hesabê yên din nayê. Mîna ku tê zanîn eger problem li ser maseyê çareser nebe, bi riyên din tê çareserkin. Piştî civîna REHE'yê ya bê encam, Rûsyayê êrîş bir ser Çeçenîstanê. Helbet sedemên ve êrîşê yên din jî hene. Bi ya min girêdanek di navbera ve civîn û êrîşê de jî heye. Rûsyayê bi vê helwesta xwe, xwest bi raqîbên xwe bide zanîn ku wisa bihêsanî ji ya xwe nayê xwarê. Jixwe DYA û Almanyayê reaksiyonên Rûsyayê yên muhtemel li ber çav di-

girtin û zêde giraniya xwe nedidan ser Rûsyayê.

Gotineke me ya pêşyan heye: "Hêstir radibin hev, ças û golik di bin lingên wan de diçin."

Di dîrokê de ev mînak jî ne kêman. Çeçenîstanê di 1991'î de serxwebûna xwe dabû xuyakirin û Rûsyayê wê demê pêdiviya êrîşkirinê nedîtibû. Gelo çi qewimîbû ku şer di dawîya 1994'an de rû da?

Ev bûyerên hanê ji çend alîyan ve bivê nevē me jî, ji nêzîk ve têkildar dike.

Tirkiye endamê NATO'yê û REHE'yê ye û niha jî hewl dide ku bibe endamê Yekîtiya Ewrûpayê. Dîsa dewletên li bakurê me mîna Çeçenîstan, Ermenîstan û komarên Tirkî li Asyaya Navîn bûne endamên REHE'yê.

Dewletên Rojava ji bo ewlekarî û berjewendiyên xwe mudaxeleyê dikin. Reqabet û nakokiyên di navbera Rûsyayê û bi taybetî DYA û Almanyayê de li ser Kafkasyayê, Asyaya Navîn û Rojhilata Navîn, wê bidomin.

Tevgera Rizgariya Neteweyî dikare van nakokîyan baş binirxîne û jê sûdê wergire.

FAL



BERAN (21 Adar - 20 Avrêl)

Hin tengasî derketine pêşiya we, lê tengasî dertêne pêşiya herkesî. Zehf nefikirin. Di nêzik de deriyekî mezin û hesin wê li ber we vebe. Bêhnfirehî mirov dertîne ronahiyê. Gava bêhna we teng bû, binivîsinin an jî têkevin greva birçitiyê.



GA (21 Avrêl - 21 Gulan)

Hûn di van rojan de li xwe qet nanêrin. Êdî dev ji derdorên xwe berdin, hinek jî bi xwe re eleqedar bibin. Her çiqas hûn însanekî/ê bi tedbîr bin jî, ji ber eynadiya xwe hûnê zehf poşman bibin û di quncikê xwe de rûnin.



CÊWÎ (22 Gulan - 21 Pûşper)

Hûn çawa bilez xwe noqî nava pirsgrêkan dîkin, wisa jî, ji nişka ve ji ber çavan winda dibin. Pir caran kesên ku baweriya xwe bi we tînin, hûn wisa zoq dihêlin. Heke hûn wisa dewam bikin wê kes li dora we nemîne.



KEVJAL (22 Pûşper - 23 Tirmeh)

Rojên li pêş, wê ji bo we hin serêşiyên çêbikin. Ya rast ew e ku hûn bisebr û qerar çavê xwe ji ser hedefa xwe neneqînin. Ji cihekî dûr wê çend qirûş pere jî, ji we re bên. Lê çî feyde ku berikên we qul in.



ŞÊR (24 Tirmeh - 23 Gelawêj)

Birca we ya ku bilind dibe êdî nabirige. Ji şikefta xwe derkevin. Hê jî hûn dibêjin em qral in? Naa! Êdî bes e! An hûn ji mafên heywanan bêxeber in, an jî wekî insanan, we xwe li keriyê daniye.



SIMBIL (24 Gelawêj - 23 Reşber)

Ev hefte ji we re ne baş xuya ye. Xwe ji belayan biparêzin. Hay ji xwe hebin. Dilê heval û dostên xwe nehêlin. Dawiya tengasiyan firehî ye.



MÊZÎN (24 Reşber - 23 Kewçêr)

Bêqerari û tembeli ne baş e. Divê hûn hin qeraran bidin. Ev qerar di jiyana we de cihekî girîng wê bigirin. Li ser wan baş bifikirin jiyana we ronahî ye.



DÛPIŞK (24 Kewçêr - 22 Sermawez)

Emirdayîna mirovan li xweşiya we diçe û bi vî awayî hûn mirovan ditirsînin. Lê dîsa jî hûn nefsbîçûk in. Dev ji daxwaza xwe ya ku divê mirov ji xwe re bibin kole, berdin. Li hemberî mirovan biînsanî hereket bikin.



KEVAN (23 Sermawez - 21 Berfanbar)

Gerek e êdî hûn dev ji vî sersariya xwe berdin. Hevalên dora we ji we pir şikayetê dîkin. Heval û dostên xwe bipirsînin û bi ser wan ve herin. Li hêviya we ne.



KARİK (22 Berfanbar - 20 Rêbendan)

Hûn ji tertîbiyê hez dîkin. Dixwazin herkesên li dora we jî bi tertîp be. Û ji bo wê yekê hevalên li dora xwe jî teşwîk dîkin. Ev tertîpbûna we, gerek e hevalên we aciz neke. Carina tiştan nebînin.



DEWLİK (21 Rêbendan - 11 Reşemî)

Li gorî hevalên we hûn li asîmanan difirin. Divê hûn werin erdê. Dev ji xeyalên vala berdin. Rastiya dinyayê ne wekî ku hûn dibînin e. Hay ji xwe hebin. Çavên xwe vekin.



MASÎ (20 Reşemî - 20 Adar)


Çavê we ronî be. Di van rojan de gelek pere dikeve destê we. Êdî ji aliyê aborî ve hûn tengasiyê nakîşînin. Lê tiştê heye ku mirov zehf meraq dike, çavkaniya van pereyan ku der e? Hêvî dikim ku ne pereyên heram bin.



DEMIRAL & GOLDÎ



Wi fermana xwe hilda,
wê derketa nêcîrê.



Li hespê xwe siwar bû.
Hespê got: Emê dîsa bi dû Daltonan,
pardon DEP'uanan bikevin?
Wi lêvegerand: Na. Emê îcar biçin
serdana Özgür Ülkeyê, pist re jî herin
haydûte bi navê Yaşar Kemal bigirin




Ez nêcîrvan im
Xwediyê Seyê resen
Nobedar im
Li komara Tirkî

Zanyar im
Li serkustîna mirovan
Lê, ax goldî, goldî
Dil çawa dikişîne vî kul û derdî

Nêcîrvan: Va ye ruhê goldiyê min
Hesp: Na lo, tu êdî xewnerojkan dibînî, ev
nişana nû ya komara me ye.



Ew rojên xweş hatibûn
bîra wî.



Dengê hespê ew bi ser xwe ve anî:
Ez jî vî rojnameya Özgür Ülke
tiştêkî fêhm nakime, sansûr çî ye?
Ew lê vedigerîne: Xwezî ez li Stenbolê
bûma, kesî qet tiştêkî jê fêhm nedikir.



Dîsa vegeirî ser
ramanên xwe, ponîjî.



Ev roja reş hate bîra wî
Mirina birayê neviyê wî, Goldî.

Metin * Sami * A. Gölbaşı

Wî berî 400 salan dîroka kurd û Kurdistanê nivîsand

ŞEREFXANÊ BIDLÎSÎ Û ŞEREFNAME



Şerexan di sala 1597'an de dest bi nivîsandina pirtûka xwe kiriye, piştî du salan bi xebateke berdewam pirtûk kuta kiriye, lê bi zimanê farisî ew pirtûk nivîsandiye. Cara pêşîn di sala 1860'an de li Sanpitrosborgê ji aliyê F. Milinov, Zirinov ve hatiye weşandin û pêşgotineke hêja ji bi zimanê fransîzî der heqê Şerexnameyê de hatiye nivîsandin.

Şerexanê Bidlîsî dibêje: "Heya niha kurdan û xeynî kurdan ji tu tişt der heqê me de nenivîsandin, lewma min ji biryar stand ku li gorî hêza xwe, dîrok û serpêhatiya serok û serdarên kurdan berhev bikim û di pirtûkekê de binivîsim. Nav ji lê bikim "Şerexname". Bi tenê ji mebest û armanca min ev e; divê mezin û serkêşên me navên wan winda nebin û keda wan bête parastin."

Şerexan di sala 1597'an de dest bi nivîsandina pirtûka xwe kiriye, piştî du salan bi xebateke berdewam pirtûk kuta ki-

riye, lê bi zimanê farisî ew pirtûk nivîsandiye. Pirtûk cara pêşîn di sala 1860'an de li Sanpitrosborgê ji aliyê F. Milinov, Zirinov ve hatiye weşandin û pêşgotineke hêja ji bi zimanê fransîzî der heqê Şerexnameyê de hatiye nivîsandin. Tê de ev gotin heye: "Rûmeta zanistî ya vê dîrokê cihê guman û kêşe nîn e, di gel ku 300 sal ji bi ser de derbas dibe hê ji di rojhilata navîn de karekî wisa ku di serwiyeya wê de be, nehatiye kirin."

Ji bilî weşana Sanpitrosborgê ji çend carên din Şerexname hatiye weşandin, di sala 1930'an de li Misirê bi farisî hatiye weşandin, di sala 1958'an de ji erebiya wê ji aliyê M. Alî Ewnî ve hatiye wergerandin, her li Misirê û ji aliyê wezareta perwerde û fêrkirdinê ve hatiye. Nivîskar û dîrokvane kurd Mela Cemil Rojbeyanî ji Şerexname wergerandiye ser zimanê erebî û gelek perawêzen girîng jê re çekirine.

Di vê berhema mezin de Şerexan dibêje: "Ji ber ku kurdan tu car di bin siya serokatîyê de kom nebûne, lewma li hev nakin û xwîna hevdu dirêjin, guhdarî hêdîbûnê nakin û pir zû bi hêrs dibin." Xuya ye çavkaniya Şerexan ji wekî bi xwe

dibêje, ji hindê nivîsên farisî û serpêhatiyên ku wî ji mirovên bi temen (bi emir) û xwedî ez-mûnên kurd bihîstine, pêk hatiye.

Ev berhema mezin ku der heqa dîroka kurd û Kurdistanê de hatiye nivîsandin, bi tenê bi zimanê kurdî nîn bû, heya ku rewşenbîrê hêja û nivîskarê bi nav û deng Hejar ew wergerand ser zimanê kurdî (zaravayê soranî). Di sala 1972'an de "korî zanyarî kurd- Enstîtuya Kurdî- Bexdad" wergerandina Hejar diweşîne û belav dike. Hejar pêşgotineke binirx ji boy Şerexnameyê nivîsandiye ku 44 rûpel e. Xuya ye ku Hejar bi cureyeke baştir Şerexnameyê bi gelê xwe dide naskirin, ji ber ku bi zimanekî wisa wergerandiye ku pir tekûz û lebar e. Komeleyek ji rewşenbîr û dîrokvane kurd ji şahîdên vê rastîyê ne û der heqê wergerandina Şerexnameyê de fikir û ramanên xwe nivîsandin. Heya niha ji rewşenbîrên kurd dibêjin: "Dibe ku wergerandina Hejar ya Şerexnameyê bibe bingeh, ji bo zimanê yekgirtî yê kurdî."

Şerexnameya ku wergerandina Hejar e, bi tevî pêşgotin, perawêz û lêkolînên xwe ve 1047 rûpel e.

PISMAM

MIROVAHIYÊ DI AUSCHWITZÊ DE RÛYÊ FAŞÎZMÊ DÎT

Roja 27'ê rêbendana 1945'an dema leşkerên Yekitiya Sovyetê ketin Auschwitz'ê heyirî man. Komandarê bi tecrûbe General Vasily Petrenkoyê ku yek ji emegdarê şer bû, digot: "Min dît ku gelek mirov hatin kuştin, gelek mirov hatin dardekirin û şewitandin, lê dîsa ji li hemberî menzereya Auschwitz'ê, ez ne amade bûm." Tiştê ku ew heyirî dihişt rewşa zarokan bû. Ew ji bo mirinê terk kiribûn.

Berî ku kamp rizgar bibe li wir 65 hezar kes hebûn. Naziyan dema dît ku wê tîk biçin, ji xeynî 7 hezar kesî yên din ji bo ku bi rê ve bikujin bi xwe re birin. Ew 7 hezar kes ji jixwe kesên nexweş û zarok bûn.

Ev kampa mirinê ku li navçeya Oswiecim ya Polonyayê, hatibû avakirin. Li wir nêzîkî milyon û nîvek mirov bû mewan, piraniya wan cihû û kesên li dijî faşîzmê bûn. Ji van hinek bûn xweli û dûman, di firinan de hatin şewitandin. Pir hindik kes ji wir xelas bûn, lê birîna ku di giyana mirovan de vebûbûn bi hêsanî nedihat derman kirin. Wekî gotina

Feylozofê Avusturyayî Primo Leviyê ku piştî 33 salan bi destê xwe dawî li jiyana xwe anî, "Kesê îşkencedîtî wisa bi îşkenceyê dimîne."

Di bihara 1944'an de dema rewşa Almanyayê li hemberî Yekitiya Sovyetê xera bû, refê yekemîn yê cihûyên macar anîn Auschwitz'ê. Di nava du mehan de bi trênan ji welatên wekî Hollanda, Fransa, Slovakya, Yewnenîstan û Macarîstanê 438 hezar cihû anîn wir. Auschwitz kampa herî mezin ya naziyan bû, lê tu sedem tune ku mirov bibêje ya herî xerab bû. Mirovên ku dianîn dikirin du biran, yên ku bi kêrî kar dihatin didan aliyekî, yên din ji bo şewitandinê didan aliyê din.

Kesê ji kar re hatibûn vegetandin, di karên giran de dixebitîn. Di şertên normal de imkana jiyane li wir tunebû. Mirov di barakayên biçûk de diman, rojê du caran îctîma hebû, piştî ku dîl li nik hev rêz dibûn, ji nav, yên qels dineqandin, dibirin firinê. Xwarina wan ji xurînî û taştê tenê fincanek qehwe, ji bo firavîne şor-beyeke wekî avê bû. Parçeyek


nan ji ji bo şivê didan wan. Ji bo ku bi jîn mirovan dizî dikir.

Di gel van tiştan dîsa jiyana didomîva. Wekî dibêjin, "Dera

lê zilm heye, berxwedan ji heye." Li Auschwitz'ê ji liberxwedan û heta evîn ji hebû. Çîroka Mala Zimmertbaum û



Auschwitz, berî ku rizgar bibe zarok ji tê de warê 65 hezar kesî bû, car caran ji ji aliyê generalên Nazî ve dihat teftîşkirin. Li jêr Generalê naziyan Himmler (yê navîn) di teftîşê de tê dîtin. Li jor ji zarokên kampê li nik hev rêz bûne, li benda teftîşa wî ne.



Edward Galinski mînameke li berxwedan û evînê bû.

Zimmertbaum li kampê xwedîyê statuyêke taybet bû. Ji ber ku wê bi gelek zimanên biyan dizanibû, wek wergêr dixebitî, lê wê ji bo tevgera li-berxwedanê ji alîkarî dikir. Heta nasnameyên kesên ku wê bihatana şewitandin, bi ya kesên ku berê hatibûn şewitandin diguherî. Edward Galinski ji girtiyekî polîtîk ê polonî bû. Dilê wan kete hev, wan bertil da serbazekî nazî û çekekî leşkerî bi dest xistin, di 24'ê pûşperê de ji kampê reviyân. Her çiqas ew piştî du heftiyên li başûrê Polonyayê hatin girtin ji, rêvîna wan bû jêderka hêviyê ji bo dîlên din. Dema di 15 rezberê de amadekiriya daliqandina wan tamam bû, tewra wan hêvî xurtir kir. Li ber sêdarê Galinski bend kir stûyê xwe, piştî ku bang kir, got: "Bijî Polonya!" pêhnek li kursiyê da. Zimmertbaumê ji li hemberî girtiyên jin, bi jîletekê qevdika destê xwe, birî û wisa can da. Çavkanî: Kovara Newsweek'ê

SAMÎ BERBANG

HETA SALA ÇÛYÎ JÎ LI DIBISTANÊN NORWECÊ ZAROKÊN KURD BI ZIMANÊ XWE DERS DIDÎTIN. LÊ MIXABIN ÎRO:

ZAROKÊN KURD LI NORWECÊ LI MAMOSTEYÊN KURDÎ DIGERIN

Rewşa

zarokên me

Li çar aliyê dinyayê, di hemû civak û welatên pêşketî û medenî de hin mafên bingehîn hene ku ji aliyê herkesî ve diyar in û herkes dikare wek şexis an jî netewe ji wan mafan îstîfade bike. Îstîfadekirina ji wan mafan ne zerarê lê feydeyê dide herkesî. Mixabin îro dewleta tirk hê jî bi inkarkirina mafên bingehîn ên gelê kurd ve mijûl û bi asimilekirina şexsiyeta kurdan re eleqedar e.

Li aliyê din, li gelek welatên Ewropayê zarokên kurd bi salan e ku dikarin bi zimanê xwe bixwînin, binivîsin û dersan bibînin. Bes, tevî vê yekê, li wir jî vê carê kurd rastî problemên din tên. Nebûn an jî kêmbûna kurdên di hin waran de pîspor rê nade ku kurd ji van mafên bingehîn îstîfade bikin. Mesela li Norwecê jî ber nebûna mamosteyên zimanê kurdî, zarokên kurd ji mecbûrî bi zimanên din dersên dibistanê dibînin û nikarin bi zimanên xwe perwerde bibin. Gelo bi rastî jî mamosteyên zimanê kurdî tun in? Hebin çawa dikarin destê xwe dirêjî van zarokan bikin an jî ku tunebin çî çare tune ji vê pirs-girêka girîng re? Li ser zarokên kurd ên Norwecê nûçevan û nivîskarê me Memo Darrêz nûçeyêke pêwîst li Norwecê amade kir. Bi vê nûçeyê em dixwazin ku hemû eleqedarên kurd bala xwe bidin vê nûçeyê û li ser bifikirin.

Dema mirov lingên xwe davêje hundir avahiya rengsorik rastî wêneyên renga rengîn tê ku bêhna ji hev cuda ya welat û qitayan jê tê. Li diwarên dibistana Îla nexşe û sembolên çanda 22 welatan li hev dinêrin û di kenin. Ne hewce ye ku mirov here odeya rektor û bikeve dû lêkolînan ka li vir çî heye. Li diwarê ser destê çepê, Mem û Zîn ketine kêleka çemên Ferad û Dicleyê û evîna xwe ji hev re dibêjin. Ev nexşe û wêne bi mirov didin zanîn ku şagirt û mamosteyên Kurdan li vir bûne mêvan û şopa xwe hiştine. Dibistana Îla bûye nîşana "civatake rengîn

ya dewlemend".

Ji 22 welatan zarok

Di dibistana Îla'yê de ji 22 welatan (Ji Awûsturyayê ta Afrika û Rohilata Navîn) ji 100'î zêdetir zarok hene. Di nava wan de mirov rastî zarokên ji çar perçeyên welatê me jî tê. Dibistan li bajarê Trondheim e û di sala 1980'an de ji bo zarokên biyanan ku li Norwecê dijîn hatiye avakirin.

Li vir dersên kurdî 4-5 salan berê dest pê kir û sala çuyî jî ji ber nebûna mamosteyên Kurd xelas bû. Di nava van salan de nêzîkî 20 şagirtên kurd ev derfet bi kar anîn. Di dibistana Îla'yê de nêzîkî 60 şa-

girtên kurd hebûn û bi piranî jî kurdên Konayê bûn (gişt nebe piraniya kurdên vir, di navbera salên 1986 û 1989'an de wekî penaber hatin. Îro li vir nêzîkî 450 kurd dijîn). Şagirtên ku kurdî nedigirtin, tirkî tercîh dikirin. Dibistan mafê tercîhkirinê dide dê û bavan. Li bajarên Stavanger û Osloyê jî kurdî dest pê kiribû, lê ji nebûna şagirtan nemeşî.

Heftiyê 3 saet dersên bi zimanê zikmakî

Dersên ku li Îla'yê tên dayîn bi norwecî û zimanê zikmakî (zimanê dayik) ne. Ji bo şagirtên polên 1-3'yan (ku bi norwecî barnetrinn e)

seetên zimanê zikmakî jî yê Norwecî zêdetir in. Her şagirtêk di heftiyê de xwediyê 8 saetan e. Her ku pol ber bi jor ve diçe, hejmara saetên zimanê zikmakî jî dikeve. Ji bo şagirtên ku li welatê xwe çûne dibistanê, lê di dersan de eger rewşa wan nebaş be dersên ekstra tên dayîn. Dibistan ji bo şagirtên dibistana pêşîn û navîn e. Ji ber vê yekê di odeya mamosteyan de mirov rastî rengên ji hev cuda tê. Hema hema niviyê mamosteyan biyan in. Dibistan bi zimanê zikmakî xwendin û nivîsandina pêşîn ji xwe re bingeh digire. Sedemê jî wilo şîrove dike," Zarok zimanê zik-

makî jî norwecî baştir dizanin. Qet nebe li wir bingehê gotin û bêjeyan heye. Ji bo vê yekê zarok zûtir hînî xwendin û nivîsandinê dibin."

Mamosteyên biyan

Di dibistanên wekî yê Îla'yê de norwecî wekî andresprak (zimanê duyemîn) tê binavkirin û mamoste jî norwecî ne. Lê dersên zikmakî jî aliyê mamosteyên biyan ve tên dayîn û navê wan jî bi norwecî morsmalls-laerer (mamosteyên zimanê zikmakî) e. Mamosteyên biyan ku li vir dersan didin an penaberên ku li vir dijîn e an jî xwendevan ên ku ji bo xwendinê hatine vir in.



Koroya mamosteya zarokên hindikahîyan



Di dibistana Îlayê de ji 22 welatan zarok hene.

Polên ku li vir in wekî polên amadeyî hatine avakirin. Her şagirtêk dikare heta 2-3 salan li vir dersan hîn bibe. Piştî 2-3 salan (li gorî rewşa şagirtan) şagirt êdî dikarin di dibistanên hêrema ku ew tê de dijîn de dest bi xwendinê bikin. Li wir jî şagirt dikarin di hefteyekî de 2 saetan dersên zimanê zikmakî bibinin. Lê, ev jî bi giranî dikeve piştî demên adetî (yanê dema dersên norwecî xelas bûn).

Mafê zimanê zikmakî

Li her bajarê Norwecê nebe jî li piraniya bajarên ku tê de biyan hene, dibistan û polên wekî yê Îla'yê hene/hebûn. Li Norwecê jî ku û çawa (wekî penaber, karker, xwendevan...) tê bila were mafê wî/wê yê perwerdeyiya bi zimanê zikmakî heye. Herkesê ku bixwaze, dikare wî mafî bi kar bîne. Ji bo wî mafî plan hatiye çêkirin û di resmîyê de cihê xwe girtiye. Di pirtûka "Monsterplan for grunnskolen (1987)" (Ji bo hemû dibistanên

Norwecê ên pêşîn e) rûpel 181, beşa 24'an de armanca dayîna zimanê zikmakî wilo hatiye şirovekirin:

Rola dibistanan

- Afirandina duzimanîyê. Zarokên ku di rewşa duzimanîyê de mezin dibin, divê bi kêrî herdu zimanan jî werin. Vê derfetê jî inçex dibistan dikare bide wan. Bi riya dibistan û di jiyandê bikaranîna zimên, zarok dikarin herdu zimanan bi pêş ve bibin. Ziman di axaftinê de navgîneke (araç) girîng e. Bi vê navgînê ew dikarin agahî û zanînan peyde bikin û dikarin bi heval û hawîrdora xwe re bikevin têkiliyan. Di wî warî de zimanê zikmakî roleke mezin dilîze. Ji bo civateke biharmonî pêşvebirina zimanê zikmakî bingehe. - Pêşvebirina çanda hindekahiyan. Hewce ye ku zarok der barê borîya xwe de bibin xwedîyê agahiyan. Bi vê riyê ew dikarin bi xwe, bi kesaneziya xwe bawer bibin.

Hedefên pirtûka dersên zimanê zikmakî jî wiha tê pêşkêşkirin:

- Divê şagirt li ser lîteratura welatê xwe bîn motivekirin ku ew bikaribin xwedî li kesaneziya xwe, nîfş û çanda xwe, malbat û welatê xwe derkevin û bi wan jî serbilind bibin.

- Divê şagirt di derbarê welatê xwe û çanda hindekahiyan yê li Norwecê bibin xwedî agahî û zanîne.

- Divê danîna zimanê wekî bingehe bê girtin. Yanê gerek e hindekariyeke wilo bê dayîn ku şagirt bikaribin zimanê xwe deynin û pêşve bibin...

Pirtûkên dersên kurdî li Norwecê

Li gorî planê, di dibistanan de armanca hindekariyeke birêkûpêk ew e ku şagirt bibin xwedî agahî û zanînen rast. Ji bo vê yekê jî divê pirtûkên ku di dersên zimanê zikmakî de tên xwendin, jî aliyê dibistanên norwecî ve bîn qebûlkin (pejirandin), şertên ku dibis-

tan dixwaze tije bikin; hem jî aliyê qelîteyê ve hem jî, jî aliyên din ve li cih bin. Tiştên wekî propagandaya polîtîkî û hwd. tê de tunebin. Ji bo çêkirina pirtûkên nû dewlet alîkariyê jî dide.

Di dibistana Îla'yê de pirtûkên ku ji bo zimanê kurdî dihatin bikaranîn:

- Em bixwînin, em bîvîsîn

- Em bixwînin 2

- Cografya Kurdistanê, Tîgrîs- Germiyanî

- Dîroka Kurdistanê, Tîgrîs- Rezazî- Gardawan

- Kurterastî, Tîgrîs, Welatevîn

- Kûrtçe Gramerî, Celadet Bedirxan- Roger Lescot

- Çîrokên M. Emîn Bozarslan (Melayê meşhûr, Mîr Zoro, ...)

- Pirtûkên Astrîd Lîndgren ku wergerandine kurdî

- Materyalên din.

Dîroka mafgirtina zimanê kurdî

Li Norwecê dîroka mafgirtina zimanê zikmakî dûr e. Heta zimanê miletê Samiyan

ku li bakurê Norwecê dijiyan jî 30-40 sal berî niha dihat qedexekirin û pê henek dihat kirin. Herwiha biyaniyên ku piştî 1970'an wekî karker hatin Norwecê bêhînbûna zimanê Norwecê dîrekt diçûn febrîqeyan û dest bi kar dikirin. Di salên 1970'an de çavkaniyên petrolê hatin kifşkirin û rê li ber endustriyê giran vebû. (Îro Norwec di îxçekirina petrol û gazê de di rêzên pêşîn de cih digire) Vê yekê bi her awayî rewş guherand. Di her warî de maf zêde bûn. Ji wan yek jî di dibistanên Norwecê de dayîna mafê perwerdehiyê bi zimanên zikmakî bû. Wilo dixuya ku hem jî bo Norwecîyan hem jî, jî bo komên hindekahiyan çerxa zêran dest pê kiribû! Pêl bi pêl penaberan dabû pey hev di sînoran de ketibûn rêzê ku ji çerxa zêran para xwe bigirin. Her tişt belaş dixuya! Norwecîyan perên xwe vekiribûn, biyaniyan xwe kişandibûn bin, rûyên Norwecîyan dikenîyan. Pir bû. Bavê

ji xwe re, lêw ji xwe re dikişand! Ji qilubeyên telefonan heta bîrbîngan deng bilind dibûn: "Lawo mezeke! Qamyon û zeviya xwe bifiroşe were! Dewlemendî davêje." Amerîkayeke nû hatibû kifşkirin.

Rewşa îro

Lê, niha demê jappe-tîdê derbas bû. Norwecî êdî bi xwe hesiyan! Bi sendromekê ji xewnê rabûn! Tiştên ku çend salan berê bi rasîzmê dihatin binavkirin, îro bûne bingeha tebatên resmî. Li serbajar Oslo zimanê zikmakî rabûye. Sedem aborî û faktorên din bin jî wilo tê ziman: "Zarokên biyanan nikarin norwecîyeke baş hîn bibin. Gelekî bi zimanê xwe diaxifin û di dersên norwecî de jî bi ser nakevin. Dema nikaribin zimanê norwecî baş hîn bibin, nikarin kar jî bigirin û entegreyî civata Norwecê bibin. Hingê cîwanên biyan yê bîkar dikevin kolan û kuçan û dibin krîmînel."

MEMO DARRÊZ

Ji aliyekî ve hêzên ARGK'ê li cerdevanan didin, li aliyê din;

Cerdevan xwe bi xwe li hev didin

Ji 20'ê rêbendanê û vir de şer wekî li çiyayan li metropolan jî gur dibê. Li gelek bajarên Kurdistanê û metropolên Tirkîyeyê livbaziyan gerilayên ARGK'ê zêde dibin.

20.1.1995

Li çola di navbera Farqînê û Pasûrê de gerilayan êrîşî leşkeran kir. Di êrîşa gerilayan de 5 leşker mirin, 3 leşker birîndar bûn.

Kesek bi navê Maşallah Söyler li Edeneyê li taxa Denizliyê hate kuştin. Tê gotin ku, 'Maşallah Söyler' îtirafkar 'bûye û ji esnafan bî zorê pere standine. Kuştina wî timên bajaran yên ARGK'ê hilgirt ser xwe.

Sercedevanê gundê Nivîna Şêrwanê, Halil Bala, li Stenbolê taxa Sultanbeyliyê ji aliyê hêzên ARGK'ê ve hate kuştin.

Cerdevanan li Dêrikê li gundê Meşeliyê di nav xwe de şer kir. 5 cerdevan mirin, 8 cerdevan birîndar bûn.

21.1.1995

Gundê Henidiliya yê Mêrdînê, ji aliyê hêzên dewletê ve hate şewitandin.

Li Mêrdînê, gundê Şêxgirê ji ber pêkutiyên hêzên dewletê hate valakirin.

Cerdevanên gundê Xerepreşkê li hev dan, 7 cerdevan mirin, 7 cerdevan birîndar bûn.

Polîsekî siyasî li Stenbolê mirî hate dîtin. Der heqê bûyerê de agahî bi dest neketin.



Li Kercewsa Êlihê, gerilayan avêt ser gundê cervanan Bağlicayê, di cerda gerilayan de 2 cerdevan mirin, yek jî birîndar bû.

12 şûbeyên banqeyan hate bombe û molotof kirin. Ew livbaziyan ku li gelek dewerên Stenbolê çê bûn, endamên TKP/ML-TİKKO hilgirtin ser xwe.

22.1.1995

Di navbera Misircê û Qubînê de, konvoya leşkeran li mayînên gerilayan leqî. 8 leşker mirin, 2 panzer texprîp bûn.

Li dora qereqola Eynê ku Şernexê ye, bi mayînên gerilayan gelek

leşker mirin û birîndar bûn.

Şûbeyaya İş Bankası'yê hate molotof kirin. Endamên THKP/C berpişyarî girt ser xwe.

Polîs û cerdevanan di navenda Culemêrgê de li hev dan. Komîserê mir, polîsek û cerdevanek birîndar bûn.

23.1.1995

Gerilayên ARGK'ê û hêzên dewletê li çola Sasone li hev dan. Di şerê di navbera gerilayan û leşkeran de 8 leşker mirin, 20 leşker birîndar bûn.

Li çiyayê Gebarê, leşker ketin kemîna gerilayan. Di kemîna gerilayan

de 3 leşker mirin.

Panzereke leşkerî li nêzikî Êlihê wergeriya. 4 leşkerên di panzerê de birîndar bûn.

Di navbera Amedê û Licê de erebeyeke leşkerê wergeriya, 8 leşker birîndar bûn.

24.1.1995

Li çola Hênê gerilayan êrîşî leşkerên ku derketine operasyonê kir. Di êrîşa gerilayan de 2 leşker mirin, 2 leşker birîndar bûn.

Li gorî agahiyên Kurd-A'yê; 'Gerilayan avêt ser gundê cerdevanan Midilbê, di cerda gerilayan de gelek cerdevan mirin û birîndar

bûn.

Operasyona hêzên dewletê ya li aliyê Dihê ji ber serma, berf û xelabûna erzaqê sekinî.

Cerdevanan li gundê Xirabreşkê di nava xwe de li hev dan. 2 cerdevan mirin, 3 cerdevan birîndar bûn.

Ji ber pêkutiyên hêzên dewletê, gundê Kirdilekê ya Mêrdînê hate valakirin.

25.1.1995

Li çola Xêzxêrê, gerilayên ARGK'ê êrîşî leşkerên ku derketine operasyonê kir. 8 leşker mirin, 2 leşker birîndar bûn. 2 erebeyên leşkerî îmhâ bûn.

Erebeyaya cerdevanan di navbera Şernex û Amedê de wergeriya. cerdevanek mir, 4 cerdevan birîndar bûn.

Hêzên dewletê camiya gundê Zeko ya Bismilê şewitand. Tê gotin ku, sebebê şewitandina camiyê qebûlnekirina cerdevaniyê ye.

Li Stenbolê du kes bi navê Asker Simko û Zeyya Nazim hatin kuştin. Tê gotin ku, her du kesan jî alikariya MIT'ê dikirin. Kuştina wan ARGK'ê hilgirt ser xwe.

Li Stenbolê bayiyeke AEG'ê hate bombe kirin. Komîteya Herêma Marmarayê ERNK'ê ev livbazi hilgirt ser xwe. Gotin ku, livbazi ji bo protestokirina qetlîamên Kurdistanê û şewitandina gundan hatiye kirin.

26.1.1995

Di çola Pasûra Amedê de, gerilayên ARGK'ê cerdî ser leşkeran kir. Di êrîşa gerilayan de 3 leşker û gerilayek mirin, gelek leşker birîndar bûn.

Li Çewlikê, di navbera gerilayan û leşkeran de şer derket. 2 leşker mirin û gerilayek mir, 2 leşker birîndar bûn.

Boriya petrolê ya di Qubînê re dibore hate bombekirin. Gerilayan 2 kuleyên petrolê jî texprîp kirin.

Li gorî agahiyên ku ketin dest, hêzên dewletê li Çiyayê Cûdî, li mintiqeya Grê Sor ji bo operasyonê hêzên xwe dicivînin.

Navenda Nûçeyan

Lem rojane da, agri şerekî narewa zorbey nawçekanî başûrî Kurdistanî girtotewe, ew îş şerî birakujî, yan rast tir bilêyn, şerî xokujî û kurd-kujî nêwan herdu hêzî mezinî gorepanî başûr, YNK û PDK ye. Dîrokî em şerî kurd le naw birdin e degeretewe bo deyan sal pêş emro, her le diway hereşênî şoreşî Mela Mustefay Barzanî yewe, heta emro berdewam buwe gerçî şewazekeşî cuda bûbêt.

Le seretay şerî nêwan Iraq û Îran da dîsan herdu hêz heta le tiwanayan da bû le

Le başûr; baasî qiran e yan kurd qiran ?!

çiyakan be wêzey yek de hatin, belam ew dem şer weku witman le çiyakan rûy da û le gel be dîr bû, rastewxo ziyan be gel nedegeyîşt diway karesatî cerîg birî ENFAL û be hewl û koşîş û le jêr palepestoy dostanî herdu lada, le salî 1988 da Berey Kurdistanî (BK) damezra û be şeweyekî katî nakokiyekanî nêwan herdu hêz berew çareser kirdin çû. Belam diway serheldane mezinekey salî 1991, hêze

derekiyekanî pêkhatû le welatanî hawsê û rojawa kewtine helpay konrolkirdinî barudox le Kurdistanî Başûr, boye her le seretay geranewey YNK û PDK ewe bo niştiman, mîlmilanê nakokiyekan berew firawan bûn deçûn, be corê ke legel helbjîardîna parلمان û damezrandîna hukumetî herêma Kurdistan da ew nakokiyaneş perey send ta geyîşt be ewe ke gel çawerîwanî dekirî û lêy detirsa, wate kulandin ewe birinî

kon û helgîrsanî şerî birakujî. be guman herdu rijemî faşîstî tirk û Iraq, rastewxo le şerekanî par û estay başûr da dewrî şerekî degêrin, be taybetî Turkiya ke xoy mezin tirîn perçey Kurdistanî kirdiwe be gorepanî şer û qirej tirîn corî şer le mêjû da derheq be gelî kurd piyade dekat, lem lawe xoy kirdiwe be axay başûriyan û benzîn be ser agreke da dekat hanî layenêk diji ewî tir dedat. Pêwîst e ke gelî kurd le

başûr le aga bêt û dost û dujminanî xoy nas bikat, ne dewletî tirk û ne Iraq hîçiyar dostî kurd nîn, îtir pişt bestin be ewan le pay çî ?! Ewey ke dost û palpiştî ême bêt, tenha gelî Kurd e, çî le başûr bêt yan le bakûr yan le rojhelat. Diwêne hemû be yek deng hawar man dekirî; basî qiran e, keçî êsta wa debînin hevokî kurd qiran ba yek bikujin. De ba ew hele mêjûye ke le başûr helkewtuwe le dest nedeyn û ew karwane bigeyenîn be menzîlî serbexoyî.

BEKÎR BAHÖZ

ZIMANÊ KURDÎ Û TÎPÊN LATÎNÎ (2)

DIVÊ ZIMAN NEYÊ XESANDIN

Xortên me yên ku li gundan nejîya ne, van dengan ji hev dernaxin. Li gorî dengên bingehîn, hînî zimanê nivîskî bûne. Ji ber dengên kêr, bilêvkirina bêjeya li hev siwar dikin. Bê çawa nivîsandiye welê dixwînin. Ango zimanê xwendin û axaftinê nizanin. Bi ser de jî rexneyan li nivîskaran digirin. Ji aliyekî ve mafê wan jî heye; welê dizanin.

Zimanzan, zimanan nakesixînin, dişitilînin, aşêf dikin (ji bêjeyên biyanî paqij dikin). Rastî ev e, zimanzanîti ev e, xizmet ev e. Tirs min ev e ku rewşenbîrên me dê rojekê bibêjin: "Xwendin, axaftin û nivîsandina bi zarê kurmançî dijwar e. Tirkên em hînî tirkî kirine, va ye em bi zimanê Ewropîyan jî dizanin, kurmançî jî me re ne pêwîst e. Ka em dev ji vî zimanê tevlihev û ku li alfabezan jî naedile berdin." Bîrano, hevalno, rewşenbîrno, nivîskarno û zimanzano divê bi her awayî em li zimanê xwe xwedî derkevin û dewlemendiya wî biparêzin. Zimanê xwendin, nivîsandin û axaftinê, nola zimanê her neteweyî bikin yek ku, di

pêserojê de em fedîkar û rûş dernekevin. Em hîna di serê sedê de ne. Derfetên fireh di destê me de hene. Em ji destê xwe nerezvînin. Ji bilî van di rêziman de qayideyek heye, ew jî ne pir girîng e. Du tîpên jî hev, nayên nik hev. Nivîskaran jî ber dengên kêr, ev qayide jî mêt ve rakirine, berdane. Wekî: Pirr: çok - kerr: sağır.

Çend mînak

Bêje û navên ku nivîsandina wan yek, lê xwendin û bilêvkirina wan jî hev û din cuda ye, min li xwarê (jêr) navnîş kirine.

Çem: asa- Çem(chem): rûbar
Çal: alaca- Çal(chal): kortik
Ka: ver- Ka(kha): saman
Kanî: hani- Kanî(khanî): pînar
Kar: iş- Kar(khar): oğlak
Ker: eşek- Ker(kher): sağır
Kew: leke- Kew(khew): keklik
Kal: ham- Kal(khal): ihtiyar
Kêr: bıçak- Kêr(khêr): yarar(lı)
Peya: gurur- Peya(pheya): ya-ya kişî
Pol: sınıf- Pol(phol): kürek kemiği
Par: pay- Par(phar): geçen sen
Ta: sıtma- Ta(tha): dezi, iplik
Tû: tükürük- Tû(thû): dût
Tar: amûrê muzîkê- Tar(thar): tîrê
Torik: cureyek masî- Torik

(thorik): wawik, çeçel
Tol: intikam- Tol(thol): çapkın, berduş
Tu: hiç- Tu(thu): sen
Kêl: bir tartı birimi- Kêl(khêl): dikili taş, kaba taş
Kon: eski- Kon(khon): kıl çadır (khonê reş)
Ji bilî van dengan (Z) û (R) jî heye, lê ne zehf girîng e.
Zirav: ince- Zirav: öd kesesi
Têr: tok- Têr: heybe
Pir: köprü- Pir: çok
Birin: yara- Birin: kesmek
Ber: ürün- Ber: halı
Herî: çok- Herî: çamur û hwd...

Rexneyên nerast

Xortên me yên ku li gundan nejîya ne, van dengan ji hev dernaxin. Li gorî dengên bingehîn, hînî zimanê nivîskî bûne. Ji ber dengên kêr, bilêvkirina bêjeya li hev siwar dikin. Bê çawa nivîsandiye welê dixwînin. Ango zimanê xwendin û axaftinê nizanin. Bi ser de jî rexneyan li nivîskaran digirin. Ji aliyekî ve mafê wan jî heye; welê dizanin. Lê nivîskar xeletî nekiriye, rast nivîsandiye. Rexneya ku Nûşer Dîlan di der barê "Êşa Zirav" de li Gabar Çiyan girtiye, ne li rê ye. (Rojnameya Welat, hej.94, rûpel:2). Gabar Çiyan navê pirtûka xwe rast nivîsandiye. Ez Gabar Çiyan xweş dinasim, navê wî yê zikmakî jî dizanim. Em xal û xwarziyê hev in. Êşa Zirav biwêjêke taybetî ye. Tuberku-loza pişikê (kezeba sor) ye. Ew mirovê bi vî êşê dikevin jar û zirav dibin. Ji ber vî yekê ew navê taybet standiye. Ne êşa kişikê zaferanê ye. Bilêvkirina zirav (ince) nerm e, narîn e. Ya zirav (öd, kişikê zaferanê) Z û R qalind e, qebe ye. Zirav (ince) Z û R bi serê ziman, zirav (öd kesesi) Z û R bi noqa ziman tê derxistin (gotin).

Daxwazek ji sazî û zanîngehan

Daxwaziya min ji sazûmana ziman û rêziman ya zanîngeha kurdî ev e: Herkes dizane û tîgihîştîye ku we barekî mezin û berpirsiyariyêke neteweyî hildaye ser milên xwe. Derfetên we kêr in û astengên we zehf in. Di nava xwe de dev ji kêşeyê berdin. Ch, kh, ph, th, yêbi kar bînin. Ne zor e, ne zehmet e. Pir hêsan e. Hûn dikarin di salekê de du caran navê mehan biguherînin û bi me navên 12 mehan bi du cureyan bidin jiberkirin. Ma em nikarin tîpa h'yê, di ber ya c'yê xin? Li wê sazûmanê rastkirin û pejiwandin; li me jî jiber kirin. Bila zehmetiya carekê be lê, ne kesixandin û seqetkirina zimanê kurdî be.


Î. OMERÎ

DEFTER

Bazirganiya pûç û vala

Dinya digere û tê guhertin. Herwiha her tiştên ku li ser rûyê dinyayê hene jî, li gorî hebûn û taybetiyên xwe, ew jî tîn guhertin. Lê, tiştêkî biseyr (eçeyîb) heye ku em kurd bi zûtirîn tîn guhertin. Hema hema guhertina me wekî çerx û felekê ye. Em bi lez û beztirîn dizivirin. Çawa? Wiha... Heta du sê sal berê, me kurdên bakur rexne li rêxistin û kurdên başûr û rojhilat dikir ku: "Çima ew ji bo Iraq û Îranê demokrasiyê û ji bo xwe jî otonomiyê dixwazin." Me jî ber vî yekê jî, ew bi mêtî û helwestên eşîrtî, otonomîst diyar dikirin. Ji aliyê çînî ve jî me ew feodal û burjuwaziyan biçûk dihejmartin.

Belê, îro rewş çî ye? Îro kurdên başûr bi wesîteya kê dibe bila bibe, ji daxwazên otonomiyê ber bi federasyonê ve gav avêtin. Yên bakur, ji daxwaz û armanca serxwebûnê bi paş ve çûn daxwaza nasnameya (kîmlîka) kurd dikin. Em dev ji federasyonê berdin, em behsa otonomiyê jî nakin. Di van demên dawî de, gelek kes li ser navê xwe, li ser navê dem û dezgehên kurdan û li ser navê rêxistinên kurdan ên ku nav hene û ew bi xwe tune ne, derdikevin televizyon, radyoyan û diaxivin. Di axaftinên xwe de, dubare dikin, "Em Tirkiyeyê parçe nakin. Federasyon û otonomiyê jî naxwazin. Em bi tenê dibêjin: Kurd jî li Tirkiyeyê hene û bila nasnameya wan bête qebûlkin, di dem û dezgehên herêmî de hinek guhertinên qanûnî çêbikin, bes e..." Yanî ew dixwazin wekî kurd li Kurdistanê di belediyan de cih bigirin û ewqas! Gelo haya wan jê tune ku şer û têkoşîna riz-



AMED TÎGRÎS

gariya neteweyî ya Kurdistanê, niha di kîjan pile (derece) de ye, çî ye? Ji deh salan ve heta niha bi hezaran şehîd hatin dayîn. Bi milyonan kurd jî ser axa xwe hatin koçberkirin. Îro bi milyonan Kurdistanî di nav vî şer û têkoşînê de bi aktivî cihên xwe girtine û tîdikoşin. Dewleta Tirk ketiye krîzeke aborî, siyasî û leşkerî ku nikare ji nava derbikeve. Di vî dema girîng de, hinek kes û derdorên ku heta niha bi karê xwe daketîbûn, îro li ser navê kurdan derketine holê û bazirganiya siyasî dikin. Ev plan û stratejî vala ne û pûç in. Yek, êdî gelê kurd ne wekî çend salan berê nezan û bêpolîtîka ye. Ew bi xwe 10 sal in ku di nava şerê azadiyê de şer dike û bi her cureyê şer û polîtîkayê dizane. Dido, serokekî wî heye ku nêzikî 20 salan e ew tîdikoşe û gelê kurd wê wekî serokatiya neteweyî qebûl dike. Sisê, gelê kurd ne wekî çend sal in berê bîrêxistin û bêpergal e. Ew xwediyê rêxistîneke modern û şoreşger e. Di her warê jiyana de bîrêxistin e. Ji rewşenbîran heta karker, gundî, esnaf û komên dîni hatine bîrêxistinkirin. Ya herî girîng bawerî, parastin û garantiya vî têkoşînê jî, 30 hezar têkoşerên li serê çiyayên Kurdistanê ne. Divê baş bête zanîn ku bazirganiya vî şoreşa neteweyî ya mezin nayê kirin. Bedêla wê giran e. Bedêla xwîna şehîdan nayê firotin û kirin!


Di kurdî de muzîkeke cihêreng

Kaseta Ciwan Haco ya dawî di sersalê de derket. Ciwan Haco di vî kaseta xwe de jî, ji bo nûjenkirina muzîka kurdî hin formên nû diceribîne.

Di kasetê de ev stranên jêrîn cih digirin. Li berga A: Serbariyek, Ziravê, Bida, Gula deviya, Siba, Şervan. Li berga B: Dûrî, Yara derew, Dîl ji min bir, Çavreş, Esmer, Lawê min.

Enstrûmanên ku di kasetê de hatine bikaranîn, ji aliyê biyaniyan ve û bi awayekî şarezayî hatine lêdan. Enstrûmanên ku hatine bikaranîn û kesên ku lêdidin ev in:

Drums, percussion: Paola Vinaccia
Elektroakustik gîtar, gîtar, ûd û Armonîka: Knut Reiersrud
Bass-gîtar: Kjell Arne Jensen
Akordiyon: Eivind One Pedersen
Elektrik Gîtar: Morten Molster
Şnaytzer Keyboards: Trond Inge Olsen
Flût, zirne: Hasse Jorgensen
Vokal, saz: Ciwan Haco
Kaset bi navê "Dûrî" û ji aliyê weşanên Çarçira ve hate weşandin.



DERWÊŞEKÎ MEZIN DI QEWLÊN ÊZIDIYAN DE

HISÊNÊ MENSÛR - HELAC

Gelo çi tşkiliya Helac bi êzidiyan re heye? Tevî ku Helac mîna dîndarekî îslamê ye û wekî kesekî sûfî tşk naskirin, lê di bîngeha hizrên xwe yên derwêşî de, xwediyê bîr û baweriyên taybetî bû ku bi kokên xwe, xwe digihand dînen Îranê yên kevin û bi taybetî êzîdîtiyê.

Helac, bi nav Hisênê Mensûr e. Di nava hozaniya (fîlezofîya) derwêşiyê (sûfîzm) de cihekî berz û bala digire. Helac, li bajarê Beyzayê (li Îranê) hatiye rûyê dinyayê. Di dema Ebasiyan de dijiya. Bîr tûj, hîstenîk û dîlşewitiyê mirovahiye bû. Li dijî zordar û xwînmîjan herdem bîr û bawerî û gotina xwe mîna şûrê rastiye dikişand. Ne zindan û ne girtîgehan, ne jî, qamçiyê celadan nikaribûn Helac ji riya wî bi paş ve vegerînin. Di dawiyê de serê xwe bi gorî bîr û baweriyên xwe kir.

Di axaftineke xwe de, ji Şêx Cinêd (Cineyt) re ku hogirek jê rebaza derwêşiyê (sûfîzmê) bû dibêje:

- Bo çi ev malê zehf û zor di destên hin kesên taybetî de ye û yên kar dikin û renc didin hêstireke bi tenê nîn e.

Şêx Cinêd dibêje:

- Ev e qismetê wan ê ku Xwedê daye wan.

Helac:

- Bo çi Xwedê bi terzekî baştir vî malî lêk venake?... Ayî! Heke rojeke bi tenê destûra min dabûya ku lêk vekim, min dê hemû alem razî kiribûya.

Ev axaftin dibe sedema bidarvekirina Helac û şewitan-dina laşê wî. Di roja 26'ê adara 922'an de, dadgerê Bexdayê yê aliyê rojhilat Ebû Omer bin Yakûb Şêx Hesen fermana bidarvekirina Helac da. Her wiha laşê wî sotin û bi ava Dicleyê de berdan.

Niha nîşana Helac mîna ya hemû xasên êzidiyan li geliyê Lalişê heye. Xewlekî dirêj jî, li ser tşk gotin.

Gelo çi tşkiliya Helac bi êzidiyan re heye? Tevî ku Helac mîna dîndarekî îslamê ye û wekî kesekî sûfî tşk naskirin jî, lê di bîngeha hizrên xwe yên derwêşî de, xwediyê bîr û baweriyên taybetî bû. Bi kokên xwe, xwe digihand dînen Îranê yên kevin û bi taybetî êzîdîtiyê. Helac, Ezazîl (Iblîs) sûcdar nedikir, ew mafdar didît ku, ji Adem re secde nekiriye ji ber ku: "Ezazîl jî nûrê û Adem jî qûrê bû." Dema

bidarvekirinê berevanî ji Ezazîl dixwest. Ew bi xwe jî xelkê Beyzayê ye û hin dibêjin ku ji Ormê ye. Ne dîr e ku tşkiliyên xwe bi bîr û baweriyên êzidiyan re hebin. Jixwe felsefeya derwêşiyê di Kurdistanê de, ji van bîr û baweriyên ne dîr e. Helac jî yek ji pêşengên vê felsefeyê ye.

Di qewlê Helac de, astengiyên wî yên di nava destê zebehiyên xelîfeyê Ebasî Muqtedir Bilah de, diyar dibin. Gazinên wî ji birayê wî yê axretê Şêx Cinêd hene, lewre nehênîya wî eşkere kiriye. Di vê astengiyê de, kes lê xwedî dernakeve. Heta bi xwişka wî Xecêya Xoristanî, ew jî jê direve.

Qewlê Hisênê Mensûr - Helac
Ji bada ney dîn im
Mesta melomînin
Werin halê Hisên bibînin
Ji bana we fer bûye
Hisên çû bêrecû ye
Hisên serê xwe dabûye
Hisên li hîseyî e
Ewî vexwar ji kasa beyn e
Lew serê xwe dabû fer li eyn e

Hisên li Helac e
Ewî vexwaribû ji kasa sîh û mîlanc e
Lew bû şera qaziya
Hisênî serê xwe dikire armanc e

Ey çako ji çakêd Meda
Hisêno çakê cewda
Padşê min kasek bi te da
Lew Hisênî serê xwe li ber rê û îtîqada xwe da

Hisên li Bexdêdî
Ewî vexwaribû ji kasa Hêdî
Hisênî serê xwe kire fêdî

Hisên li Bexdelî
Li ber wê surê nesebirî
Lew bû şera qadiya
Hisên bi serê xwe bû mişterî

Hisên li Helac e
Bi reva xwey rehwan e

Lew vêra gehîşt bû nac e
Wê li mêhê miskînê
Hey baziyo ji hêlinê
Li xwe megire revînê
Em jî tebayî te hatîne ber rûyê sikînê

Mîha ser ji beran e
Wa li Hisênî didet tanana
Hisêno revîn eyb e bo mêran e

Hisêno revîn eyb e
Kuştina mêra ne ecêb e
Xasma serê tey bi hisêb e

Hisên li van maniya yî biqar e
Ewî li xwe girtibûn ber û dar e
Lew hawareke birê axretê re dihinare

Hawareke birê axretê re dehişte
Xecîca ji Xoristanê hat û gehiştê

Ewê jik Hisên bi tehna dikuştê
Hecîca li Xoristan e
Rêya sê mehan e
Hatibû heft gavan e
Hisêno giyan te çi giyan e
Biçûk li min biran e
Giyan bispêre Xwedê û dostêd ezman e

Giyan bispêre û here
Me mêvanek heye ji sefer e
Heta ruh ji qalibê te bête dere

Xwişkê Xecê belê belê
Bi wê rojê kim roja li enzelê
Min kasek vexwar ji serê kelê
Kasa kerem e û da pê biçîn belê
Xecê xwişka xwo me

Ni serî daye bideme
Da bizanîn dinya û alem e
Ya mêra sur e û kerem e

Hey Hisêno birê minê axretê
Hero ku roj hiltê ji milê ometê
Heft kasî qudrêtê
Tên bo min hurmetê
Êkî rojekê rastî ji dilê min der-netê

Hero ku roj hiltê ye
Heft kasî qudrêtê ye
Tên bo min hurmetê ye
Qet rastiye jî devê min der-têye

Hisên disipare
Li Bexdayê û çendî şar e
Hisên miskîn di azar e

Li Hormê hizin û şîn e
Li Bexdayê şayî ye û mizgîn e
Kuştibû Hisênê miskîn e
Li Bexdayê û çendî şar e

Niha nîşana Helac mîna ya hemû xasên êzidiyan li geliyê Lalişê heye. Xewlekî dirêj jî, li ser tşk gotinê.

Şayî dibûn kifar e
Hisên zergûn û azar e

Hisên guleke di gulê de
Hinciyê hat berek lê da
Û Şêx Cinêd gulek lê da

Hisên guleke nû kamil e
Wê li Bexdayê hoye zalim e
Û hinciyê hat lê da bû kevir e
Şêx Cinêd gulek lê berda vekire
Dersad (saet) jê mabû dil e

Hisên guleke nûşikiftî
Û baya tehiya di axiftî
Lew şerîet pê şikiftî

Hey Şêx Cinêdo birê minê axretê
Çend dar û berê binê vê ometê
Hemû bo min û giyanê min tşk
Heta roja ome li qiyametê
Nalînêd min ji destê gula te tşk

Şêx Cinêdo çendî digirîm çendî dinalim
Kesî nezanî ezî bi çi hal im
Te dizanî ezî bi çi hal im
Heta roja em li qiyametê dê ji destê gula te nalim

Hisênî surî bû
Rêya heq nasî bû
Lew Şêx Cinêd lê xurî bû.

Çavkanî:

- Êzdîtayî, Xidir Silêman û Xelîl Cindî
- Zargotina Kurda, Ordixanê Celîl û Celîlê Celîl
- Ehmedê Xanî, hozan, fêlezûf û derwêş, Dr. E. M. Resûl

SELÎM BIÇÛK



Li ser dîwarên Laleşê hin nivîsên ku baweriyên êzîdîtiyê didin xuyakirin.

RÛPELEK JI DÎROKA ROJNAMEGERIYA KURDÎ

KOVARA KURDISTAN

Dr. Kemal Mezher Ehmed der heqê zimanê rojnameyê de ji wiha dibêje: "... Lê ji wan hejmarên ku min dîtine welê diyar e ku ji herdu hefteyan carê bi pênc zimanan (kurdî- tirkî- erebî- farsî- frensîzî) derdiket. Ez bawer nakim ku li dinyayê tu rojname yan kovar hebe ku gotarên xwe bi pênc zimanên cihê belav kiribe."

Kurd ji rojnamevanîyê re ne xerîb in. Li gorî gelên Rojhilata Navîn, bi hêsanî dikare were gotin ku ev gel xwediyê dîrokeke kevin a rojnamevanîyê ye. Rojnameya pêşîn, kurdan li Qahîreya Misirê bi navê 'Kurdistan'ê derxistine. Roja derketina rojnameyê 22'yê avrêla (nîsan) 1898'an e û ji aliyê kurdan ve wekî roja rojnamevanîya kurdî tê pîrozkirin.

Dema em li dîrokê dimêzin, dibînin ku çî çaxa kurdan ji xwe re ferisend dîtine, lez dane derxistina rojnameyan. Bi taybetî ji piştî meşrûtiyetê, di sala 1908'an de. Di dema Osmanî de kurdên ji her aliyê welêt ku li paytexta vî împaratoriye

Stenbolê diman, li derxistina rojnameyan xebitîne. Di dema Şerê Cihanê yê Pêşîn de weşandina rojnameyan hatiye sekinandin. Di pey Mutarekeya Mondrosê re kurdan careke din dest bi kar û barên çap û weşaniyê kirine. Lê piştî biserketina tevgera kemalî(st) di vî warî de bédengiyek heta salên 1950'yan domiyaye. Heke em ji bo nimûne navên çend weşanên ku di destpêka sedsala bistan de dest bi jiyane kirine bidin:

Şark ve Kurdistan (Rojhilat û Kurdistan); 1908, Stenbol

Amid-i Sevda; 1909, Stenbol


Peyman; 1909 Amed
Rojî Kurd; 1913, Stenbol

Hetawî Kurd; 1913, Stenbol

Jîn; 1918, Stenbol
Kurdistan; 1919, Stenbol

Mebesta me ew e ku em li ser kovara bi navê "Kurdistan"ê ku navê wê li jorê bihurî bisekinin. Ev kovar di 31.1.1919'an de li Stenbolê derketiye û kovareke siyasî, civakî, edebî û ilmî bûye. 31'ê rêbendanê roja salvegera vî kovarê ye. Tam 76 sal berê ev kovar hatiye weşandin.

Li gorî ku Cemal Xeznadar û Elaeddîn Secadî agahî didine me, 37 hejmarên wê derketine.



Berga Kovara Kurdistanê

Dr. Kemal Mezher Ehmed der heqê zimanê rojnameyê de ji wiha dibêje: "... Lê ji wan hejmarên ku min dîtine welê diyar e ku ji herdu hefteyan carê bi pênc zimanan (kurdî- tirkî- erebî- farsî- frensîzî) derdiket. Ez bawer nakim ku li dinyayê tu rojname yan kovar hebe ku gotarên xwe bi pênc zimanên cihê belav kiribe."

Nasnameya Kurdistanê

Xwedî: Mehmed Mîhrî

(Hilav)

Sernivîskar: Arwasîzade Muhemmed Şefîq

Berpirsiyarê nivîsaran: Seyîd Huseyîn

Çapxane: Necm-i İstikbal, Stenbol

Nîşe: Ji kitêba "Li Kurdistanana bakur û li Tirkîyeyê Rojnamegeriya Kurdî (1908- 1992)" ya Malmîsanîj û Mahmûd Lewendî hatiye îstifadekirin.

ZANA FARQÎNÎ

ÇEKÊN KÎMYEWÎ

Li Kurdistanê û li Rojhilata Navîn Çekên Kimyayî Biyolojîkî û Atomî. Dr. Celadet Çeliker, Weşanxaneya DOZ'ê, 1992, Stenbol.

Pirtûka ku bi navê "Li Kurdistanê û li Rojhilata Navîn Çekên Kimyayî Biyolojîkî û Atomî" wisa tê xuyakirin ku piştî Iraqê li Helebçeyê di sala 1988'an de çekên kimyayî bi kar anî, hatiye amadekirin.

Dr. Celadet Çeliker, di vî pirtûkê de bi giranî li ser dîroka van çekan, a li Iraq, İran, Tirkîye û Sûriyeyê dike. Pirtûk, bi awayekî kronolojîk tarîxa van dewletan a siyasî, tîkiliyên bi kurdan re û der barê xebat û bikaranîna van çekan de, agahiyên dorfireh dide. Mirov dikare bibêje ku di zimanê kurdî de xebatake bi vî rengî cihê, pir kême e.

Dr. Celadet Çeliker di pêşgoti-

na pirtûkê de vî dibêje: "Bi sedan sal in ku çekên kimyayî ji aliyê dîroka mirovatîyê ve tên bikaranîn. Lê belê di tu demê de, ev çek bi qasî ku li hemberî gelê Kurdistanê hatine bikaranîn, nehatiye bikaranîn."

Di pirtûkê de sê beş hene: Beşê yekemîn; Li Rojhilata Navîn belavbûna van çekan.

Di vî beşê de li ser tîkiliyên kurdan û dewletên dagirker tê sekinîn

Beşê duyemîn; Xisûsiyetên van çekan.

Di vî beşê de qala gazên jahrê (Siyanîd, xerdel, fosfor), bombeyên Napalmê û gelek cureyên van çekan tê naskirin. Xisûsiyet û tesîra bombeyan û xwe parastin ji wan û dermankirina li hemberî wan ji bo mirovan ji wekî agahî di vî beşê de cih digirin.

Beşê sêyemîn; Peymanên nav-

Dr. Celadet Çeliker

**LI KURDISTANÊ
Û ROJHILATA NAVÎN ÇEKÊN
KÎMYAYÎ-BIYOLOJÎKÎ Û ATOMÎ**

**Berga pirtûka "Li Kurdistanê
û Rojhilata Navîn Çekên
Kîmyayî-Biyolojîkî û Atomî"**

neteweyî

Ji protokola Cenevrê ya sala 1925'an heta Konferansa Parîsê ya li ser "Qedexekirina çekên kimyayî" gelek agahî hatine berhevkirin.

SUUT KILIÇ

REWEZ

(Be soranî)

Erkî dezga huneriyekan

Rewşî hunermendan û erkî dezga huneriyekan Hêmin dellê: Bizane to ewî ehlî huner bê Debê yan derbeder yan desbeser bê. Hunermend û jiyani xos mehal e Hunermend renceroye, jînî tal e.

Diyar e hunermendî kurd îş ber le her şitêk mirovêkî gelekeyetî û beazar û janî gelekey ra dejî û lîyê cûda nabêt ewe. Nek her eme û bes, belkû hendê car le mirove asayekanî naw komelekeş naqola û nalebar tir jiyani be ser debat û kes îş xoy lê be xawen nakat.

Be rastî Mam Hêminî Mûkuryanî rastî gutuwe, jiyani xos û pir keyf û sefa roje rêyek le hunermend ewe dūr e, belam ême le em roy barî roşinbîrî û hunerîman da, le gel hebûnî derd û meynetiyeke, detiwanî kemêk le barî qurs û be azarî ser şanyan sūk bikeyn û toze şîrneyek tîkel be talî jiyanyan bikeyn, ke hem wan hest be pişt û pena biken û hem sūd îş le behre û tiwana huneriyekan yan werbigîrêt.

Aşkîra ye em erkeş be piley yekem dekewête ser şanî dezga hunerî û roşinbîriyeke gelekeman, ke debê emro bibne dalde û xanewey ew hunermende belengaz, pertubilaw û le kar westawaney ke yan her be carê legel dinyay nasikî huner û ciwanî da lîk dabirawin û tîkel be cencalî û tîkçrawî kar û kesabet bûne û be mişûrî peydakirdinî parwe nan ewe roj dedene dem roj, yaxud tenha balin û natwanin bêpişt û pena karêkî pîr le ciwanî le baxçey hunerî da bixemilînin.

Her wek min agadar û bexeber im em ro le başûr, rojhelat, mîtropolekanî Turkiya û welatanî Awrupa komele hunermendekî namo be rewşî rojgar û

civatî em roy geleke-man damaw û ramawane bê çare û perêşan in... Pêwîst e ewan îş û dezgakan îş man le yektir bigerên û yektir bibinin ewe, da ku be hev ra cilewî karwanî huner û dahênan berew mentil bigirne dest.

Hergîzawhergîz barî nalebarî ew hunermende azîzem le bîr naçê û berdêkî req û pîr keser e, bom heris nakrê, ew hunermende mamostay peymangay hunere ciwanekan e û pisporî "Piyano" ye keçî le Atînay paytextî huner û ciwanî da serqalî peydakirdinî nan û xo bijêwî kar kirdin e, bo ew mebestes şanî dawete ber karî pirteqal rinîn ewe.

Ey kurd... Ey ewaney xotan be dilsozî kurd û Kurdistan dezanin, ba hemûman le mêjûy dūr û nîzik birwanîn, ba le diwênê, yan le emroman birwanîn, kar geystote ewey kurd be kurd be kuşt dedrê, ba lêre be diwawe xalêkî dîrokî bo ew mergesatane dabînîyîn, şanî kar û xebat man bikeyne berbestî lafawî ew negbetiye... Ba nehlîn çî dî çawî behre resen û jêhatiyekan man kiwêr bîkrên, ba le hewlî bûjandin ewe û bîninewey hunermendan man da bîn, çünke bizirkirdinî ewan bizirkirdinî huner û dahênanî kurdî ye.

De toş ey hunermende merd û rendekey kurd gûrî kar û dahênan we ber xo xewe û le dergay dezga huneriyekan bide, ew dezgayane lû to ye û bo xebat û hunerekey to awa buwe. Êweş ey dezga huneriyekan amêzî gerim û gûrî xotanya bo amade biken, dergay mîhir û wefayan be rûyekî xos û geş ewe lê biken ewe, çünke bê ewan, dezga huneriyekan debîn be: Malî gewre û dîyê wêran.

SÎRWAN NANEREQ

Her bijî Welatê Me

Ji hevalên Rojnameya Welatê Me re! Sala 1994'an çiqas saleke xedar û bi êrîşên zordariya kedxwaran bû jî, ji me re pir bi serkeftî derbas bû. Lê çî dibe bila bibe, emê di sala 95'an de dema serkeftinê û rizgariyê bidin despêkirin. Hovîti û xwîn-mijî nikare me bide rawestandin.

Em bi vê evîniya dil-germ, sersala we pîroz dikin.

Ali, Mazlum, Erhan,
Yilmaz, Xalit, Zinê

Jiyan bi te xweş e!

Berahiya hemû tiştan bi hezaran silavên germ û gur li xebatkarên rojnameya Welatê Me dikim.

Gel ve yekê Sala Ehmedê Xanî (1995) li şexsê hewe û xebata we ya berkevtî bo gelê kurd pîroz bit. Ji yezdanê dîlovan hêvîdarim Sala Ehmedê Xanî bo hemû gelên wekî kurdan bindest, deriyên jiyaneke serbixwe û azad veket.

Helbesta jêrê hati nivîsandin ji min bo we diyariya serê salê ye. Sitara Yêzdan li we bit.

Di nivîsandina min de kêmasiyek hebit qusura min mîzê neken. Rojbaş.

Jêhat Dilevîn

95 sala aştiyê ye

Merhaba gelî xebatkarên rojnameya Welatê Me. Di karê we de gelekî jêhatîti û serfiraziya dixwazim û hêvî dikim. Ya din jî dilxwestina min ev yek e ku sala nû bibe sedem ji aşti û xweşkayîyan re.

Bimînîn di xweşiyê de.

Xortê Farqînî /
Girtîgeha Ruhayê

Tovên mirovahiyê

Tovên kurdatiyê, di her warê jiyane de aj dane. Ev tovên mirovahiye ne. Van av bidin.

Bi hêviya azadî û aştiyê, em sala we ya hozan û nivîskarê kurd Ehmedê Xanî, pîroz dikin.

NÇM, REWŞEN,
ENSTÎTUYA KURDÎ

Bi navê Xwedê!

Gelek silavan li we xebatkar û rêveberên Welatê Me dikim. Hêvîdar im ku hûn her dem dilxweş û serfiraz bin.

Ev nameya min a yeke-mîn e ku ez ji we re bi rê dikim. Lê ez ji zû ve rojnameya xwerû bi kurdî, Welatê dixwînim û baweriya min ev e ku hûn xebateke gelek birûmet û hêja pêk tînin. Bi vê yekê hûn di dilê me gelê kurd de cihekî mezin û biqîmet digirin.

Dîsa silavên germ û hêviyên xweşî û serfiraziyê ji we re bi rê dikim. Di nav xweşî û başiyê de bimînîn.

M. Cevad Oğuz/Sêrt

Rexnek li Ruhayîyan

Birayên delal, merheba! Ez berî hemû tiştî ji bo ku hûn karekî wilo pîroz dikin ji we hemiyan re spas dikim. Mîna nêzîkî 70-75 hejmarên rojnameya 'Welat' xwendin. Rojnameya Welatê Me roja derket min dest bi xwendinê kir û heya bidome ezê bixwînim. Ez ji ber ku hûn nû derketine vê gavê li we rexneyan nakim. Lê çend gotinê min ji Rûhayîyan re hene. Gereke hûn li zimanê xwe xwedî derên. Rojnameya Welatê Me bi xwînîn û bidin xwedî.

Bi hêviya serkeftinê.

Remzi Kalhanlı/ Rûha

Rastîn di jiyane de ye!

Di hejmara heştê-mîn ya 'Welatê Me', di nivîsîn û çavdêriya birêz Osman Özçelik de li ser rewşa Kubayîyan bersiva berpirsiyarê ICAP'yê beşa Tirkîyê J.D.Martinez pir balkeş e.

Ji vê bersiva wî dîsa tê fêmkirin ku di pêvajoya dîrokê de îdeolojî bûye perdeya berjewendiyên neteweyî û aborî. Niha jî tifaqiyan di navbera neteweyan û civakan de li gorî van prensîban pêk tînin.

Lê çî heyf e ku niha em ne di wê rewşê de ne ku tiştêkî maddî bidine hinek welatan da ku têkiliyên wan û avdê çareseriyê Rojhilata Navîn xerab bibin.

Herwiha xaniyekî me jî tune ku em îdeolojiyêke bi dilê xwe tê de bi cîh bikin.

Lê niha li ser bedena me ya şêr, seriyekî ruvî dîberiqe û êdî em piştî perdeyê jî dibînin.

Şinasi Şen

Alfabeyê di her hejmarê bidin.

Em xwendevanê Welatê Me yê daimî ne. Pêşî ji we re sipasiyan dikin. Ji bo pêşketina zimanê me em hêviyan ji we dikin. Em dixwazin di hejmarên rojnameyê gîştan de alfabeya kurdî hebe. Pir mirov dixwazin ku Welatê Me bixwînin lê belê ji ber ku nizanin bixwînin rojnameyê nakirin. Ji ber vê yekê di rûpelekî de alfabeya kurdî hebe wê pir baş be.

Armanca me ew e ku, zimanên me jî wek zimanê gelê cihanê tev di çand û hûnerê de bi pêş ve here. Hûn vê pêşniyara me bigirin berçav, wê pir feydeyê bîne. Di xebata we de ji we re em serkeftinê dixwazin.

Murad- Yakup/Amed

Gelê kurd ne bêxwedî ye.

Ez nizamî çawa dest pê bikim, derdê me kurdan pir in. Her tim me derd dîtine, me lêdan dîtine, me talan dîtine, me ferman dîtine û me qirkirin dîtine. Lê me tu caran bersiva van nedaye.

Lê em çawa pêdin? He-ya niha rêberekî me tunebû û hemû sazî di destê kolonyalîstan de bûn. Lê îro gel bersiva dijminê xwe dide. Saziyên me, rojnameyên me, enîya me û hwd. me hene. Gelê kurd îro ne bêxwedî ye.

Hevalên hêja! Ez bi xwe du sal in li Almanyayê dijîm. Li Hamburgê di 'Mala Kurdan' de li ser karê çandê dixebitim. Bi rastî ez bi rojnameya 'Welat' fêrî zimanê xwe bûm. Di demeke gelek kurt de. Wekî hemû hevalan dixwazim ku kurd hemû bi dil û can li ser zimanê xwe bi sekinin.

Li ser navê "Koma Welat" li Hamburgê, ji hemû xebatkarên rojnameya 'Welatê Me' re bi dilgermî silavan dişînim. Bimînîn di xweşiyê de. Serkeftin.

Rênas /Almanya

Welatê Me mekteba me ye

Hevalên hêja, xebatkarên rojnameya Welatê Me. Berî ku ez dest bi nivîsa xwe bikim, ez bi dilekî germ û xweş li we silavan dikim. Ez ev 20 sal in ku li Germenistanê dijîm. Emrê min 21 û ez li vir universîteyê dixwînim. Bawer bikin min heta niha guhê xwe ne dabû zimanê xwe. Li îro me rastiya xwe êdî dîtîye. Em dixazin bi zimanê xwe bixwînin. Ji ber vê yekê rojnameya Welatê Me cihekê girîng digire. Meketebên bi zimanê kurdî îro tune ne. Meketeba me rojnameya Welatê me ye.

Ez xebata we ya hêja û pir birûmet, li gelê me pîroz dikim. Serkeftin.

Nurullah /
Germenistan

Her tişt ji bo Welatê Me

Xebatkarên rojnameya Welatê Me yên hêja, sala weya nû pîroz dikim. Daxwaza min ji bo sala nû ev e ku, ew ji gel û welatê me re azadî û serxwebûnê bîne. Her bijî hêviya me ji bo welat. Di xweşiyê de bimînîn.

Ewnî Kevir / Pîrin

Silavên germ

Berîya hemû tiştî ji hemû xebatkarên rojnameya Welatê Me re em silavên pir germ dişînin û em sala we ya (95) Ehmedê Xanî pîroz dikin.

Em her hefteyî rojnameya Welatê Me pir bikêfxweşî distînin û dixwînin. Em her dem ji we re pir sipasdar in. Ji ber ku hûn rojnameyêke li ser çand, dîrok û pîrsgrîkên kurdan derdixînin. Û xwerû bi kurdî pêşkêşî me dikin. Em ji we re hurmeta xwe pêşkêşî dikin û em ji we re pir pir serkeftinê dixwazin.

Li ser navê xwendevanên rojnameya
Welatê Me Firat Kaplan

Hin daxwazên min!

Hevalên hêja, di hejmara 8' an de di binê her rûpelê de 'Rêbendan 1994' hatiye nivîsandin. Ev kêmasiyeke teknîkî ye û ez dixwazim ku hûn vê kêmasiya xwe rastbikin. Di xaçepirsa hejmara 8' an de pîrsek wiha heye "Di wênayê de tê dîtî" di bin wêne de jî Ersin Yıldız dinivîse ev nîrxa xaçepirsê dadixîne, hinekî baldar bin, çêtir e.

Ferhengoka kurmancî dixwazim her hefte bête weşandin

Bimînîn di xweşiyê de
Silavên Şoreşgerî
M.Ali Mutlu/ Meletî

Kelemên li pêş zimên

Ez berî hemû tiştî, silavên xwe yên şoreşgerî pêşkêşî dikim û di vê xebata we ya giranbûha û hêja de pêşketina we ji Xwedê hêvî dikim.

Ez bawer im, bi nivîsên we û bi xwendina me, emê kelemên li pêşîya zimanê kurdî ji holê rakin. Zimanê bi salan hatiye girêdan wê ji bend û qinaban xelas bibe, azad bibe û wê bi pêş ve here.

Xwenas

Welatê Me gelek xweş e

Gelek silavên germ û şoreşî li we be xebatkarên Welatê Me. Me ji zû de bêriya wê kiribû û bi derketina rojnameyê em pir dilşad bûn. Em hêvîdar in ku doza Welatê Me bidome.

Rûpelên Welatê Me gelekî xweş in. Kêfa me zehf ji xaçepirsa we re tê. Her tim min peyva veşartî ji we re dişand, lê belê li ser navê hevalekî. Ji niha û pê ve ezê dîsa ji we re nameyan bi rê bikim.

Di gel silavan ez pênu-sa we diramûsim.

Salih Êzidî / Antalya


Ji Welatê Me re silav dikim

Ji xebatkarê Welatê Me û nivîskaran re silavên xwe yê germ bi rê dikim. Ji gelê xwe re serxwebûn û azadiyê dixwazin.

Hevalên hêja, çend daxwazên min ji we hene. Hûn nivîskarên quncika zêde bikin. Yaşar Kaya, Abdurrahman Dürre û hwd. Li ser şoreşa welat û bûyerên cengê zehftir bisekinin. Bimînîn di xêr û xweşiyê de.

Celil Baysal

Manşeta me ya vê heftiyê li ser rewşa zarokên kurd ên li Norwecê ye. Ev zarokên kurd ku heta berî demekê bi zimanê xwe yê zikmakî dikaribûn li dibistanên Norwecê dersan bibînin, îro ji ber bêmamostebûnê tenê bi zimanê biyan dixwînin û perwerde dibin. Li gor nûçevanê me Memo Darrêz — ku ew jî berê mamosteyê Kurdî bû. — Zarokên Kurdî di navbera dêr û mizgeftê de mane. Ne mamosteyên Kurdî hene ku dersên kurdî bidin wan, ne jî ji zimanên din baş fêhm dikin. Li ser daxwaza Welatê Me, Memo Darrêz, nûçeyêke dorfireh li ser şert û mercên perwerdehiya zarokên hindikahiyên li Norwecê, amade kiriye. Zarokên Kurdî ên ku li Kurdistanê û li welatên din ên dagirker dijîn, çî ji ber rênedana van dewletên dagirker, çî jî ji ber bêhmkanîyan, ji vî mafî bêpar in. Perwerdehiya bi zimanê zikmakî heqekî (mafekî) me yê neteweyî ye û ji bo wî û heqên wekî wî (ew jî şertek ji yên serxwebûnê ye) gelê me



Ji Welatê Me

MAZHAR GÛNBAT

Ji yekîtiya mamosteyan re

ta îro bêtejmar şehîd dane. Ji ber vê yekê kengê û li ku dibe bila bibe, dema fersend bikeve destê me, gerek e em ji van heqan îstîfade bikin. Nexasim ku ev heqekî zarokên me be, gerek e bêderengî, birêkûpêk em pê re eleqedar bibin û di warî de çî jî destê me bê em bikin. Li aliyê din di tiştên wisa de gelek caran hewldan û xebatên şexsî zêde neticeyê nadin. Ji ber vê yekê bar û kar dikeve ser milên rêxistinên kurdan yên eleqedar. Çî ne ev rêxistin. Pêşî ew ên ku doza standina mafê gelê kurd dikin. Ji ber ku gelê kurd ne tenê li welêt, li derveyê welêt jî wan di her warî de wek hêviya riz-

garkirinê dibîne. Dudo, Rêxistina Mamosteyên Welatparêzên Kurdistanê, bi dîtina min, bi vî karî re direkt eleqedar e. Wekî tê zanîn ev Yekîtiya Mamosteyan meha çûyî li Almanyayê ji aliyê mamosteyên kurd ên welatparêz ve damezirî. Eger îro rasterast ji bo zarokên Kurdistanê tiştek ji destê wan neyê, bêguman eleqederbûna bi zarokên kurd ên Ewropayê re jî karekî pewist e. Zarokên me li ku dibin bila bibin yên me ne û em mecbûr in bi wan û pirsgerêkên wan re eleqedar bibin. Zarokên me pêşeroja welatê me ne. Em çî bidin wan emê wî ji wan biçin. Eger heta îro kurd bê welatêkî ser-

bixwe mabin gelo hinek jî ne ji ber xemsariya wan a li hemberî zarokên wan bû. Îro êdî rêxistinên me di her warî de hene, gerek her yek ji wan karê xwe bêderengî bîne cih.

Mesrefên posteyê

Xwendevanên hêja ji ber mesrefên posteyê ji bo Ewropa em mecbûr in fiyeta abonetiye li dora % 15 zêde bikin. Ji ber vê yekê, ji niha û pê ve fiyeta abonetiye Ewropa wiha ye:

3 Meh ——— 35 DM
6 Meh ——— 70 DM
12 Meh ——— 140 DM

Nameyên we

Nameyên xwendevanan vê heftiyê gelek in ji ber ku di destê me de deyzek name ketine ser hev, ji bo ku li ber destê me zêde kom nebin car caran emê rûpeleke xwe bi temamî ji nameyan re veqetînin. Jixwe ne mumkun e ku em çî nameyên ji me re tên biweşînin. Lê dîsa jî em ji hemû şandêrên nameyan re spasiyên xwe pêşkêş dikin.

N A M E Y Ê N X W E N D E V A N A N

Tu pir xweş î Kurdistan

Em bindestiyê naxwazin bêrûmetî li goristanê be. Serxwebunê dixwazin, serxwebunê dixwazin. Tu pir xweş î Kurdistan, tu pir xweş î Kurdistan. **Fevzilemin Xashesenê**

Welatê Me li me pîroz be

Deng li gelê proleter û karker dikim. Deng li gelê gundî û rênçber dikim.

Li hemberî dijmin, tim ajan û birakujîyan rabin.

Tev bi hev re bibêjin: "Bes e, bes e!"

Tev bi hev re bibin dînamît û pêtên agir, bes e

Tev bi hev re bêjin: "Biranno bes e êdî ev pintitî"

Xebatkarên Welatê Me yên hêja û delal, ji were bi qasî Cûdi, Herekol, Gabar, Agirî silavan bi rê dikim, yek bi yek çavê we dir-

mîsim. Ji bo derxistina welatê Me ji were zor zor spas dikim. Li ser weşandina welatê Me em gelekî kêfxweş bûn.

Li ser navê welatparêzên Manisayê zordestîya dewletê ya li ser gelê me, girtina mebusên kurd, qetilkirina ronekbîrên kurd û terora li ser rojnameyên me protesto dikim.

Serkeftina we daxwezîya me ye, emê Welatê Me bixwînin û bidin xwendin. Bi hêvidariya rojên delal, bimînin di xêr û xweşê de.

Resul Bêwar / Manisa

Sala we ya nû pîroz dikim

Hevalên Delal! Ez sala we ya nû pîroz dikim. Sala 1995'an ji hemû gelê me re bi xêr û şahî be.

Ez rêvebir û xebatkarên rojnameya Welatê Me pîroz dikim. Silav û rêzdariya xwe pêşkêşî we dikim. Dixwazim hûn di hemû demên jiyanê de canxweş û dilxweş bin.

Ji we re serkeftin.

Refik Süt/ Stenbol

Spas ji Welatê Me re

Birêz xebatkarên Rojnameya Welatê Me. Ez berî her tiştî spas dikim ji we re ku rojnameyeke bi kurdî we gihand gelê me. Ez xwendevanekî Welatê Me yê ji Bedlîsê me. Ev hejmara Welatê Me yê sisêyan e ku ez dixwînim. Tiştek wekî xwendin û nivîsandina bi zimanê mirov, ne xweş e. Ji we daxwazeke min heye. We di rûpeleke xwe de cih bigihîndin PKK'ê û şerwanên wê, dê gelek sipehî bibûya. Gelek spas.

Bedran Bedlîsî / Bedlîs

Em serfiraziyê ji we re dixwazin

Ji xebatkarên Welatê Me re... Em silavên girtîgeha Bartînê ji we

re bi rê dikin. Em, ji weşaniya Rojnameya Welatê Me gelek kêfxweş û serbilind in. Welatê Me dibe bingeheke herî xurt ji çand û zimanê kurdî re. Rojnameya Welatê Me, ji gelê kurd re bûye mizgînekê û divê her kurdekî/e welatparêz lê xwedî derkeve. Em ji xebata we re serfiraziyê dixwazin. Silav û hurmeta şoreşgerî.

Muhammed Muhammed Yilmaz Atlığ Girtîgeha Bartînê

Bi saya we em bi pêş dikevin

Ji destpêkê û heya roja îro jî em li rojnameya 'Welatê Me' xwedî derdikevin. Ji bo xebata we em ji we re sipas dikin. Bi rastî em hîn zimanê xwe baş nizanin, lê bi saya we em roj bi roj bi pêş dikevin. Di rojê pêş de emê ji we re nameyan bişînin. Silavên hemû hevalan ji we re heye.

Silav û Serkeftin

Ahmet Ülgen / Girtîgeha Pîrinê

FERHENGOK

Arizî: Malê şexsî, malê xusûsî
Arizîkirin: Xusûsîkirin (özelleştirme)
Aştî: Sulh
Aştîxwaz: Sulhxwaz
Azmûn: Tecrûbe
Baq: Deste, boq
Berjewendî: Menfeet
Diyarî: Perû, xelat, hediye
Fêrbûn: Hînbûn
Hov: Wehşî
Hovîtî: Wehşîti
Nasname: Huwîyet, kunye
Nasnav: Sîfat (ünvan)
Pêşniyar: Pêşniyaz (öneri)
Pêvajo: Qonax, doman (süreç)
Şaho: Qû, qaza Iraqê

WELATÊ ME

Rojnameya Heftiyî
(Haftalık Gazete)

Li ser navê
ROZA Basın ve Yayıncılık
San. Tic. Ltd. Şti. adına
Xwedî (Sahibi)
Aynur BOZKURT

Gerînendeyê Weşanê
(Yayın Yönetmeni)
Mazhar GÛNBAT

Berpirsiyarê Karê Nivîsaran
(Yazışleri Müdürü)
Metin AKSOY

Berpirsiyarê Nûçeyan
(Haber Sorumlusu)
Suut KILIÇ

Redaktor
Sami TAN

Berpirsiyarê Têkiliyên Gelêrî
(Halkla İlişkiler Müdürü)
Sıraç AKSOY

NAVÎŞAN (Adres)
Ayhan Işık Sok. No:23/3
Beyoğlu / İSTANBUL

TEL-FAX
249-13 44 - 245 29 91

ÇAPXANE
Yeni Asya Matbaacılık A.Ş.

NÜNERİ
(Temsilcilikler)


Suriye- Jan Dost
Fener Rojbiyanî
Berlin- Silêman Sido
49-30-69 00 26 95
Bonn- Ahmet Baraçkılıç
49-228-66 62 49
Hannover- Selim Biçûk
49-5721-813 60
Hamburg- A.Hekim Gülsün
49-40-40 33 88
München- Mahmut Gergerli
49-871-670 884
Badenwürttemberg-
A. Rahim Ayaz
49-75453258
Swed- Amed Tigris
46-8-740 69 81
Amsterdam- Cotyar Zaxoy
31-20-613 07 66
Paris- M.S. Ayçiçek
33-1-48000401
Atina- Sirwan Reşîd
Bekir Bahoz
30-1-3634905

Di şeva HADEP'a Eminönü de Serokê navçeyê İbrahim Yaman, li hemberî kirinên dewletê bangî rêxistinên demokrat kir:


'EM HÊZÊN XWE BIKIN YEK'



Cigirê Sekreterê Giştî yê HADEP'ê
Kemal Bilget



Serokê HADEP'a Stenbolê Dr. Kemal Parlak



Serokê Rêxistina HADAP'a Eminönü'yê
İbrahim Yaman

Li Tirkîyeyê partî hene ku kengê bixwazin di karin mitîng û civînan li dar bixin û xwe bigihînin hîlbijêran. Lê partî ji hene ku ji van mafan bêpar hatine hiştin. Bi her awayî rê li ber wan û xebatên wan tene girtin.

Yek ji wan partiyan ku tehde û pêkûtiya herî mezin lê dibe HADEP (Partiya Gel a Demokrasiyê) e. Ev partî ji

kevneşopa HEP, DEP, û ÖZ-DEP'ê tê. Li ser hîmê wan a va bûye. Hejmara şehîdên wan ên ku ji bo demokrasiyê, wekhevî û azadiyê tê koşîne ji sedî zêdetir e.

Di gel hemû astengî û rêlibergirtinan, rewebirên HA-DEP'ê xwe bi riyên ji hev cihê digihînin hîlbijêrên xwe û bi wan re tekiliyan datînin. Xebat û politikayên xwe ji wan re vedibêjin û wan li dijî

siyaset û kirinên gemarî û dek û dolaban hişyar dîkin. Bi van mebestan rêxistina HADEP'ê ya navçeya Eminönüya Stenbolê şahîyeke bixwarin pêk anî. Şahî di 25'ê rêbendanê de li Restoranta Karîdes'ê çêbû. Li zêdetirî 1500'î kes beşdar bûn. Komên Navenda Çanda Mezopotamyayê yên muzik, folklor û şanoyê; Koma Çiya, Koma Amed, Koma Serhildan û Teatroya Jiyana Nû gel coşandin.

Wan salên dawî di şahî û civînan kurdan de tiştek balê dikişîne. Hêdî hêdî zîmanê kurdî û tirkî bi hev re tê bikaranîn. Li vir jî spiker

bi herdu zîmanan jî zehf xweş dîzanibû.

Pankartên ku li ser mafên mirovan, li dijî nijadperestiyê, yên li ser gelsa kurdî, arzikirina dezgehên aborî yên dewletê (KÎT) û hwd bûn dehna beşdaran dikişandin ser xwe. Eger em çend nivîsên li ser pankartan ku bi tirkî hatibûn nivîsin, li vir bîdî: "Ji nijadperestiyê re na!", "Hîn ku nebûye dereng aşî!", "Ji bo gelsa kurdi çareya siyasî"...

Di şahîya rêxistina Eminönüyê ya HADEP'ê de çav bi mirovên nas jî diket. Wekî Cigire Serokê Giştî yê HA-DEP'ê Şahabettin Özasaner,

Cigirê Sekreterê Giştî Kemal Bilget, Serokê HADEP'a Stenbolê Dr. Kemal Parlak, ji TOHAV'ê (Weqfa Lêkolînên Hiqûqa Civakî)ê Selim Okçuoglu, Serokê Komeleya Dersimîyan Selman Yeşilgöz.

Kesên ku di şahîyê de axivîn, li ser şewitandin û valakirina gundan, bînpêkirina mafên mirovan, pêkûti û tehdêyên dewletê, hewldanên avakirina partiyên li ser navê "kurdan" sekinin û hişyarbûna gel li hemberî rewş û qewiminên dawî xwestin.

MEHMET GEMSİZ



Li aliyê çepê Koma Serhildan di dema govendê de, li jor jî sahneyek ji tiyatroya Jiyana Nû